




Ji bo kurdan pêvajoyeke dîrokî dest pê kir:

'Kurd li hespê xwe siwar bûn'



✓ Piştî hilbijartinê, hinek nivîskar diyar dikin ku MHP ber bi demokratîkbûnê ve diçe. Li aliyê din, Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçeli da xuyakirin ku heya pêşengên PKK'ê û artêşa wê neyê tasfiyekirin, xebatên bo çareserîya Kêşeya Kurd bêkêr in. Serokbelediyeyê Amedê yê nû Feridun Çelik jî wiha peyivî: "Li Tirkîyeyê kîjan partî jî were ser kar naguhêre. Wê hinek derkevin bi guhê MHP'ê bigirin, ji bo berjewendiyên xwe bi kar binin û wê bêjinê: 'Tuyê vê meseleyê çareser bikin.' Ew jî mecbûr e çareser bike. Çawa ku gelek tişt bi RP'ê dane kirin."

(Nûçe:R.3)



Amed Tigrîs:

Em dê di demeke kurt de li Amedê mamostetiyê bikin!

✓ Ev ji 20 salan zêdetir e, li Swêdê, ku hîn gelek kurdan navê wê nebihistiye, kurd li dibistanan hîn zimanê xwe dibin. Tiştê herî balkêş û ecêb, dema li dibistanê zarokêk bi tenê hebe jî, mamoste wî/wê hînê kurdî dikin...!

Nivîskar û mamosteyê zimanê kurdî Amed Tigrîs, li ser dîroka perwerdehiya li Swêdê û naveroka wê, girîngiya zimanê zikmakî pirsên me bersivand.

(Hevpeyvîn:R.8-9)

ORKESTRAYA NETEWEYÎ YA KURD

Duristkirina orkestrayeke senfonî, her dem ji bo hunermendên akademîsyen ên kurd, li her çar parçeyên Kurdistanê daxwazeke dêrîn bûye. Yek ji hewlên baş di vê rêbazê de, ji destpêka salên 90'î de ji aliyê Ebdû Cemal û çend hunermendên din ên ciwan ve, li başûrê Kurdistanê dest pê kir û wan karî yek-du konsertan pêşkêş bikin.

(Dûmahîk: R-10)

'GURGEBOZ JI NÛ VE DIZÛRIN'



Hilbijartinên li Tirkîyeyê di çapemeniya cihanê de bû sedema nirxandinên cur bi cur. Tiştê ku zêde li ser hatiye rawestandin karkirina DSP û MHP'yê. Nirxandina hevpar xeternakiya gurbûna neteweperestiyê ye. Bo nimûne rojnameya Franfurter Rundschau di hejmara xwe ya rojê 21'ê avrêlê de...

(Dûmahîk:R.11)


Piştî hişyarkirina PKK'ê, tûrîzmê top avêt

QUDÛMÊ ABORIYA TIRK ŞKEST

Ev demeke kurt e ku berpîrsiyarên Tirkîyeyê ketine nava xwê û êgir. Tîrsa tîkçûyîna aboriyê tu car ev qasî rêveberên Tirkîyeyê netirsandibû. Tu dibêji qey tengasiya qeyrana konjoktûrel a li cihanê ne bes e, îcar jî di rûyê PKK'ê de aborî ketiye qeyranê. Her çiqas niha zerpa bayê vê qeyranê ne xuya be jî dê di demeke kin de her tiştî belawela bike.

(Nirxandin: R-4)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMÎ TAN

101 saliya rojnamegeriya kurdî di nav bêdengiyê de derbas bû. Lê rojnamegerên kurd di warê pîşeyê de gavên berbiçav bi pêş ve davêjin.

101 saliya rojnamegeriya kurdî û Azadiya Welat

Vê hefteyê rojnamegeriya kurdî 100 sal li pey xwe hişt, kete sala 101'ê. Di van salan de rojnamegeriya kurdî di bihurên gelekî teng re derbas bûye. Bi sedan rojnamegerên kurd hatin girtin û bi dehan rojnamegerên kurd bi destê hêzên tarî hatin kuştin. Lê digel hemû astengiya jî çapemeniya kurd jî wekî gelê kurd li ser piyan ma û li ber xwe da. Dirûvê rojnamegeriyê li gorî demê û mercên tê de hate guhartin, lê kakilê wê neguherî.

Îro jî piraniya kurdan bi zimanê xwe rojnamegeriyê nakin. Di ou rojnameyên rojane, ajansêk, çend rojnameyên hefteyî de bi zimanê tirkî an jî tirk-kurdî kar tê meşandin. Di warî de Her wiha kurd êdî di warê weşangeriya dîtbarî de jî xebatê dikin, lê di televîzyonê de jî dîsa giraniyeke berbiçav a zimanên biyanî heye. Di warî bi tenê Azadiya Welat wekî weşaneke awarte darî çavan dibe.

Digel derbasbûna 100 salî jî di nav rojnamegerên kurd de (bi taybetî li bakurê welêt) hevgerî û hişyariya pîşeyî pêk nehate. Lewre jî kevneşopa bi bîranîn û pîrozkirina rojên girîng bi cih nebûye. Pîrozkirina salroja despêkirina rojnamegeriya kurdî jî wekî kevneşopekê bi cih nebûye. Di sedsaliya rojnamegeriya kurdî bi hin çalakîyan hate pîrozkirin, lê 101 saliya rojnamegeriya kurdî wekî salên din dîsa di nav bêdengiyê de derbas bû. Di nav keftûlefên bo hîlbijartinê de hate jibîrkirin. Lewre jî li ser vê roja girîng tu çalakî pêk nehatin.

Lê ev yek nayê wê wateyê ku di warê rojnamegeriyê de gavên ber bi pêş nayên avêtin. Di warê pêşketin û nûjenbûnê êdî rojnamegeriya kurd jî lingê xwe li lingê rojnamegeriya welatên din digire. Bo nimûne weşanên kurdî jî wekî weşanên gelên din li ser rûpelên internetê xwe nîşan didin. Niha di beşa

çapemeniya kurdî de weşanên wekî Özgür Politika, Dugir, The Kurdistan Observer, Rojbaş di mêj ve li ser rûpelên internetê cihê xwe girtibû. Wan demên dawîn jî pêşî kovara Serxwebûn û piştre jî Azadiya Welat cihê xwe li ser rûpelên internetê girt.

Cihgirtina Azadiya Welat li ser rûpelên Internetê xweyê wateyêkê taybet e. Lewre yekemîn car e ku weşaneke xwerû bi kurdî û hefteyî dikeve internetê. Bi vê yekê Azadiya Welat qeyd û bendên li ber xwe dikîşîne, sînoran derbas dike û dikeve mala her kurd ku dikare bikeve internetê. Êdî dê her mirovê welatparêz karibe nûçeyên li ser welatê xwe bi zimanê xwe yê zikmakî bixwîne. Her wiha dê karibe çanda xwe ya gelêrî û nûjen ji nêzik ve nas bike.

Bi hêviya û hewla avêtina gavên mezintir, em 101 saliya rojnamegeriya Kurdistanê li hemû hempîşeyên û gelê xwe pîroz dikin.

Ejderhayê hemdemî

CAN KURD

Dewleta Tirk mîna du marên du li ser milên Dehaq derketibûn bi du rengan propagandaya xwe ya nemirovane bi du seriyan ku ji devê wan jehr dirije, êrîşî gelê me dike. Ji aliyekî ve, dewleta tirk bi mebesta "rizgarkirina Kosovayê dest-dirêjiyê li dewleta sirban dike" û li aliyê din jî, bi hemû hêza xwe li pey saziyên mîna MEDTV, Özgür Politika, HADEP, PKDW, Înstîtuta Kurdî digere da ku wan ji holê rake.

Bi ser van tiştan de jî MÎT'ê dest bi êrîşêke bi dizî kiriye li ser partiyên Kurdistanê. Bo nimûne, di vê dema

Di dema ku Ewrûpa û Amerîka ji kurdan dibêjin pêwîst e tevgera kurd bibe aşfîxwaz, New Yorkê, welatparêzên Kosova cilên leşkerî li xwe dikin û ji bo ku bikevin nav refê UÇK berê xwe didin Kosovayê


dawiyê de gelek belavokên kêm û erzan li ser Partiya Îslamiya Kurdistan (PÎK)ê û rêberê wê yê hêja Prof. Dr. Gaborî li Ewrûpa bi şeweyekî bêexlaqî û bi navê PÎK'ê tîr belavkirin. Ji bo ku vê partiyê û serokê wê Dr. Gaborî ji holê rakin, ketine nav hewldanên kirêt. Lê wekî ku kurd dibêjin: "Bila mala dewleta Romê bişewite..." Ma ev dewlet êrîşî kê dike û kê nake? Ma kî dikare vê hovîtiya dîrokî veşêre? Dewleta tirk bi nijadperestiyê, bi bînpêkirina mafên mirovan û bi durûtiya xwe êdî li cihanê deng daye.

Tiştê ku dewleta Tirk û ajanên wê yên kurd li hemberî gelê me dikin naçin serî, ji ber ku gelê me êdî hişyar bûye.. Lê tiştê, ku hîn bêhtir dilê mirovan dihejîne, ew e ku welatên rojavayê li gel vê dewletê durûtiyêke mezintir diyar dikin. Di dema ku ev dewlet êrîşan xwe dibin ser tevgera Kurdî û dibêjin, ku ev tevger hevalê şer û cengê ye û pêwîst e ew bibe tevgerê aşfîxwaz, li mezintirîn bajarên Amerîka New Yorkê, welat-

parêzên Kosova cilên leşkerî li xwe dikin û li ber çavên amerîkiyan bi slo-ganan neteweyî yên cengawerî bi rê dikevin, ku biçin li welatê xwe şer bikin. Li Almanyaya nazîk jî, min bi çavên ser xwe dît, ku komikek ji ciwanmêrên Kosova bi cilên UÇK xwe amade kirine ku li Otobûsekê siwar bibin, bi hêviya, ku ew biçin welatê xwe û li hemberî sirbiyan şer bikin. Ev ji aliyê Ewropiyan ve mîna rizgarxwazên welatparêz tîr hejmartin û xortên kurd ên, ku diçin serî li hemberî dewleta Romê ya xwînmij û mîna Zehak jehr ji devê wê dirije, mîna terorîstan tîr hejmartin. Gelo! ma cihanê ve yekê dipejirîne? Ta çi demê ew dikarin bi du pîvangan bipîvin û bi du kêlan bikêlin?

Xuyaye ewên, ku îro nikarin pir serbilind bin, heval û alîgerên rojavayê ne... Ji ber ku ew jî dibînin, ku ev rengê durûtiyê gihaye ezmanan û nema xwedayê me yê gewreban dipejirîne.

Hêviya wan bi dadmendiya Amerîka û Ewropa birin bûye... Lê dîsa jî, divê em kurd neyaran li xwe pir nekin.



Filmê "İsa" bi kurdî jîyan û ramanên Hezretî İsa dide pêş. Ev berhem, dê kesê ku hûn bawer in hûn wî nas dikin ji nêz ve bi we bide nasîn.

NAVNÎŞANA XWESTINÊ.
PK.8 Acıbadem 81020
İSTANBUL

RADYOYA MIZGÎNIYÊ

LI EWRÛPAYÊ


Her roja şemiyê (Sebte) saet di navbera 20³⁰ û 21⁴⁵ an de li ser pêla navîn (MW), 864 KHZ.

LI TIRKIYÊ

Her roj şemî û yeksemê êvarî di navbera 20³⁰ û 21⁴⁵ an de li ser pêla navîn (MW) 864 KHZ

Mizgînî, P.K. 1125
35441 Biebertal, Elmanya

Ji bo kurdan pêvajoyeke dîrokî dest pê kir: 'Kurd li hespê xwe siwar bûn'



Bi hezar salan e kurd ji aliyê xelkê ve hatine îdarekirin û her li 'hespê xelkê' siwar bûne. Lewre ji her dem 'peya' bûn. Di hilbijartinên 99'an de yekemîn car welatê xwe 'li hespê xwe siwar' bûn.

Encama hilbijartinên giştî û deverî yên Tirkiyeyê ligel Tirkiyeyê li cîhanê jî, bû sedema gotûbêj û nixandînan dîwêrê. Bi taybetî rêjeya yên MHP'ê bû cihê balkêşiyê. Bi xurtbûna MHP'ê re li Tirkiyeyê pêşî borsa êk çû. Dûre karsaz û derûdorên siyasî şaşî metel man. Di heman demê de pişporên politîkaya derveyî, der heqê tîkiliyên Tirkiyeyê û welatên cîhanê de guman û metirsiyên xwe anîn zimên û bi taybetî jî bi riya peyaman dewlet hişyar kir.

Li gorî gelek siyasatmedar û nivîskaran xurtbûna DSP'ê û MHP'ê girêdayî girtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan e. Bi baweriya raya giştî ya Ewropayê jî, girtina Öcalan bûye sedema guherîna rejîma Tirkiyeyê. Ev yek ji aliyê nivîskarên tirk ve bi awayekî sergirtî be jî tê pejirandin. Wekî mînak nivîskarê rojnameya Cumhuriyetê Hikmet Çetinkaya di nivîsa xwe de seravekî wiha bi kar anîbû: "Çepgirên neteweperest û rastgirên neteweperest." Çetinkaya di nivîsa xwe de diyar dike ku DSP û MHP bi saya girtina Öcalan bûne partiyên herî mezin. Bi taybetî jî Çetinkaya der barê xurtbûna MHP û DSP'ê de balê dikişîne ser pêvajoya piştî girtina Öcalan û cenazeyên lêkerên ku di şer de hatine kuştin.

Wekî din, ji niha ve li Tirkiyeyê guherîna MHP'ê tê nîqaşkirin. Hinek nivîskar diyar dike ku MHP xwe ji nû ve saz dike û ber bi demokratîkbûnê ve diçe. Li aliyê din Serokê Şaxa MHP'ê yê Stenbolê di bernameyê Kanal 7'ê da zanîn ku HADEP wekî şubeyên leşkerî yên PKK'ê kar dike. Dîsa Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçeli da xuyakirin ku heya pêşengên PKK'ê û artêşa wê neyên tasfiyekirin, xebatên bo çareserîya Kêşeya Kurd bêkêrin. Li ser heman mijarê nivîskara Sabahê Gülay Gökçür got ku, guherîna MHP'ê "li dijî zagonên xwezayê"

ye.

Hilbijartineke anti-demokratîk

Tê ragihandin ku HADEP'ê jî li gorî hilbijartina sala 1995'an, di hilbijartina 1999'an de serkeftineke baş bi dest xistîye. Her çiqas HADEP'ê di hilbijartina giştî de encameke baş negirtibe jî, di hilbijartina deverî de li Kurdistanê 7 bajarên belediyyê bi dest xistin. Tevî wê yekê li dora 35-40 heb belediyyên navçe û beldeyên Kurdistanê bi dest xistin. Roja ku hilbijartin dihatin lidarxistin Serokomar Süleyman Demirel diyar dike ku, dê Tirkiyeyê bi hilbijartineke demokratîk berê xwe bide sala 2000'an. Li aliyê din hilbijartinên giştî û deverî ji bo HADEP'ê di rewşeke anti-demokratîk de li dar ketin. Li gelek bajar, navçe û beldeyên Kurdistanê û Tirkiyeyê reyên HADEP'ê hatin dizîn, gelek rey hatine betalkirin û gelek rey jî ji aliyê partiyên wekî MHP, DSP, DYP û ANAP'ê ve hatin şewitandin. Li Kurdistanê jî sandoqên hilbijartinê ji aliyê tîmên taybet, leşker û cerdevanan ve hatin revandin.

Li ser hilbijartinên ku anti-demokratîk derbas bûn, rêveberên HADEP'ê didin zanîn ku, kurd di nav hesabê hilbijartina demokratîk a dewletê de nehatine fikirin. Dema raya giştî berê xwe dide hilbijartinê rastî wê tespîta rêveberên HADEP'ê tê. Wekî mînak li Mêrdîn, Qers, Îdir, Rîha û Mûş'ê di navbera HADEP û partiyên din de pêşbazîyê mezin rû da, lê ji ber ku ew herêma bi giranî dibin kontrola cerdevan û leşkeran de ye, hêzên dewletê nehiştin ku rey bi awayekî demokratîk bêne jimartin. Her wiha li bajarên wekî Amed, Meletî, Dîlok, Semsûr, Erzerom, Erzîngan, Elezîz, Şimex, Batman, Bedlîs, Wan, Çewlik, Sêrtê û digel bajarên din, hilbijêrên kurd reya xwe di-

bin siya çekan de bi kar anî.

Ligel hemû astengî, pest û kotekiyên dewleta tirk gelê kurd nûnerên xwe li heft bajarên mezin ên Kurdistanê wekî Amed, Batman, Wan, Çewlik, Sêrt, Agirî û Colemêrgê anîn ser kar. Ji aliyê din ve 29 nûnerên hilbijartî yên HADEP'ê, ji ber bendê ji mafê mebûsiyê bêpar man. 29 mebûsên CHP'ê jî ji ber heman sedemê li derveyî meclîsê man. Di hilbijartinan de li gorî encamên nefermî DSP'ê 22.49, MHP'ê 18.14, FP'ê 15.20, ANAP'ê 13.24, DYP'ê 12.15, CHP'ê 8.75, HADEP'ê 4.8 rey bi dest xist. Di hilbijartinên deverî de HADEP'ê encamake baştir (% 7) girtiye.

Di çapemeniya tirk te analizên balkêş

Di hilbijartinan de kurdan li metropolên Tirkiyeyê jî ligel hemû astengiyên zor dane partiyên din. Li Edene, Mêrsîn û çend navçeyên Stenbol û Îzmîrê di hilbijartinên deverî de HADEP bi partiyên din re kete qayîşkêşanê. Bi taybetî jî li Mêrsîn û Edene HADEP'ê reyeke bilind bi dest xist. Li navçeya Mêrsînê ya bi navê Akdenîz HADEP'ê belediye qezenc kir.


Li ser van yekê û demokratîknebûna hilbijartinan û serkeftina HADEP'ê nivîskarên rojnameyên tirk jî analiz û nixandînan rasteqînî dikin. Wekî mînak nivîskarê rojnameya Milliyetê Şahin Alpay di nivîsa xwe de da zanîn ku HADEP li gel hemû pest û kotekiyên dijwar di hilbijartinê de bi ser ketiye û dê serketitir be. Rojnameya Radîkalê jî bi seravekî nûçeyê diyar dike ku di hilbijartinan de partiya herî qezenkar HADEP bûye. Rojnameya Radîkalê got, ligel ku dewletê nehişt berendamê HADEP'ê Zeynel Bağır bikeve Liceyê jî, dîsa ew bûye serokê belediyyê.

Li aliyê din nûçegihanên Aktûelê Defne Asal û Nejdît Açan nixandîneke balkêş kirin. Ew bi bir dixin ku, li Çîna Sor û Vietnamê dîplomasiyê û aşî ji aliyê Serokê DYA'ê yê anti-komünîst û nijadperest Nîxson ve, li Filistinê înzeya aşîyê a yekemîn ji aliyê serokê rastgir ê Îsraîlê Yitzak Rabîn ve hatiye avêtin. Lewre bi baweriya wan, li Tirkiyeyê jî heman ezmûna dîrokî di çareserîya Kêşeya Kurd de, rêbaz cuda be jî, hatiye ber MHP'ê. Nivîskarê rojnameya Sabahê Cengiz Çandar jî di nivîsa xwe de da xuya kir ku çî dibêje bila bêje, di hilbijartinan de 'Başûrê Rojhilat' a HADEP'ê ye. Dîsa nivîskarê kovara Aktûelê Ahmet Altan jî da zanîn ku bi ihtîmaleke mezin, guherîn dê ji Tirkiyeyê dest pê bike. Bi nêrîna Altan, hikûmetê kî saz bike û nêzîkedayîna partiya sazkar her çî be, di navbera du salan de, ji bo çareserîya Kêşeya Kıbrıs û Kêşeya Kurd dê gavên radîkal bîn avêtin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Serokê Belediyeya Amedê Feridun Çelik:

Rejîm bi guherîna partiyan naguhere



Serokê Belediyeya Amedê Feridun Çelik li ser encama hilbijartinan pirsên me bersivandin. Çelik, diyar kir ku her çend ne bi dilê wan be jî, HADEP ligel hemû astengiyên dewletê yên mîna doza girtine, pest û kotekiya midûrên emniyetê û reydayina êşkere, di hilbijartina bi ser ketiye. Çelik, li ser helwesta gel û MHP'ê jî wiha axivî: "Li gel her tiştî girseya me dengê xwe yê aşîyê li qadan bilind kir. Bivê nevwê ev encam me dixebîna berpirsiyariyekê. Di serî de partiya me alîgirê çareserîya Kêşeya Kurd e. Bi awayekî xwezayî jî wê tîkiliyên me bi otorîteya navendî re çêbin. Ev nayê wateya guherîna HADEP'ê. MHP'ê jî encameke wisa qet hêvî nedikir. Endamên wê yên ku di nav partiyên din de cih digirtin, li hêlîna xwe vegeyiran. Heta niha ji bo kurdan ferqa ANAP'ê û MHP'ê nîn e. Çi partiya ku hatibe ser kar, bi hestên nijadî kar kiriye. Lê Devlet Bahçeli di daxuyaniyê çapemeniyê de diyar dike ku ew HADEP jî di navde cudatîyê naxin navbera partiyên ku belediye qezenc kirine. Li Tirkiyeyê rejîm divê bi destê desthilatdaran, bê guhartin. Kîjan partî jî were ser kar, ev yek naguhere. Jixwe heta niha dewlet ji aliyê kesên nijadperest ve dihatê bi rê ve birin û ev kes li hemberî kurdan bi awayekî despotîk tevgeriyane. ANAP hatiye DYP çûye, MHP hatiye Fazilet çûye. Wê hinek derkevin bi guhê MHP'ê bigirin, ji bo berjewendiyên xwe bi kar binin û wê bêjinê: 'Tuyê wê meseleyê çareser bikî.' Ew jî mecbûr e çareser bike. Çawa ku gelek tişt bi RP'ê dane kirin." Her wiha Feridun Çelik da zanîn ku gelê kurd berpirsiyareke mezin û dîrokî daye wan, ew dê lê bixebitin ku vî barî hilgirin.

Piştî hişyarkirina PKK'ê tûrîzmê top avêt

Qidûmê aboriya tirk şikest

Ev demeke kurt e ku berpirsiyarên Tirkiyê ketine nava xwê û êgir. Tirsê tîkçûyîna aboriyê tu car ev qasî rêberên Tirkiyê netirsandibû. Tu dibêji qey tengasiya qeyrana konjoktûrel a li cihanê ne bes e, îcar jî di rûyê PKK'ê de aborî ketiye qeyranê. Her çiqas niha zerpa bayê ve qeyranê ne xuya be jî dê di demeke kin de her tiştî belawela bike. Tirkiye dê hem ji ber bandora qeyrana cihanê hem jî ji ber qeyrana tûrîzmê gurbûna tengasiya aboriyê çawa çareser bike? Piranî jî li pey hîlbijartinê desthilatdariya nijadperest dê politikayê çawa bimeşîne û aboriyê bi çi awayî sererast bike?

Çimkî ev tengasî ne notî (mîna) tengasiyên berê ye. Qeyrana li Rûsyayê rê li ber firotina malê tekstîlê û damezirandina însaatê girt. Hewldanên Çîn, Hindîstan û dewletên Asyaya Navîn ji hêla pêşbirkê ve bazarên tekstîla Tirkiyê li Ewropa û Amerikayê xiste destê xwe. Bi taybetî bi pêvajoya ku Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan çûbû Îtalyayê û peyre jî bi komployê girtina wî re bayekî giran li Tirkiyê xist. Her wiha helwesta Tirkiyê ya nijadperest derkete ber çavê gelê cihanê. Dîsa êrişên li ser gelê kurd û li hemberî ve berxwedana kurdan qewimî. Pevçûn û pozberiyên li metropolan li hemû cihanê hate dîtin.

Rezervasyon tene betalkirin

Ji ber van bûyerên ku di pêvajoya dawîn de qewimîn, şêniyê Ewropayê yê ku her sal ji bo ger û qirkirina westa xwe di hate Tirkiyê biryara xwe guhart. Tûrîstên ku ji berê ve bo xwe cih veqetandibûn, rezervasyonên xwe betal kirin. Welatên Yewnanîstan, Portekîz, Îspanyayê dewsa Tirkiyê girt. Li gorî daxuyaniya Serokê Tursabê Talha Çalîmî di meha nîsanê de ji sedî 60'ê ku berê bo xwe cih veqetandine, rezervasyonên xwe betal kirine. Dibêje ku 'hêviya me ya ku di serê ve havîne de dest pê kiriye, şikestî ye. Hinek teşîs hetanî 15'ê gulanê girtî ne. Tenê hêviya me ji bo dawîya havîne ye. Bûyerên ku li Tirkiyê diqewimin bala hemû dilxwazên tûrîzmê dikişîne. Bombeya ku li Taksimê teqîya, bûyera ku li Mavi Çarşiyê pêk hat û jî bilî wan, çalakîyên ku bînavber berdewam kirin ji bo betalkirina cihveqetandina tûrîzmê bûn hincet. Li gorî daxuyaniya xwediyê Oger Tûrîzmê Vural Oger, piştî ku bûyera Mavi Çarşiyê pêk hat, di hefteya yekemîn de 15 hezar û di tevaya mehê de jî 30 hezar kesî cihgirtina xwe betal kiriye.

Her sal, ji xeynî bernameyên asayî bername dîsa çêdibûn ku tûrîstan bi balafirên ve bigihînin Antalya. Lê îcar ev ne gengaz e û heta bigire otel bi sedî 15 kapasîteyê ve dixebitin. Berê ji bo mîvandariya şevekê 150 mark di hate stendin lê niha daketiye 100 markî. Li vê yekê jî bala kesekî nekîşand û hejmeta tûrîstan zêde nebû.

Li gorî sala 1997'an sala par kompan-



Bi bûyerên dawîn re, şêniyê Ewropayê yê ku her sal ji bo ger û derkirina westa xwe di hate Tirkiyê biryara xwe guhart. Tûrîstên ku ji berê ve bo xwe cih girtibûn, rezervasyonên xwe betal kirin û çûne welatê din.

yaya Lufthansayê kapasîteya xwe ji sedî 40 zêde kiribû. Lê îsal rezervasyon ji sedî 30 betal bûn.

Kesên ku biryara hatina xwe ya bo Tirkiyê betal kirine bi piranî ji DYA, Awusturya, Hollanda, Fransa û Almaniyayê ne.

Şirkatên tûrîzmê berê xwe dan hemwelatîyên xwe

Li ser van qewimînan saziyên tûrîzmê yên li Tirkiyê biryar dan ji bo ku bi hêsanî ji giraniya xesaretê bifilitin berê xwe bidine tûrîstên li Tirkiyê. Kesên ku berê xanî û pergala xwe ji bo gelê xwe qedexê kiribûn niha jî bi pey van ketine. Rêberên tûrîzmê dixwazin ku ji bo tûrîzma hundirîn pêş ve biçê dewlet krediyê bide gel û gel teşwîq bike. Lê ev jî negihîştê serî. Îcar jî gelê Tirkiyê ji bo ger û bêhvedanê berê xwe da Ewropayê û welatê din. Çimkî hem cihêrengê û hem jî erzaniya gera Ewropayê pêşbaziyê veguhaste dijî Tirkiyê. Li Ewropayê jî hêla bicihbûn û jî hêla lêgerîne ve erzaniyê dest pê kiriye. Gava ku li gorî lêgerîn û raçavkirina kompaniyayê, gerê ev taybetiya dilxwaziya gelê Tirkiyê dît, biryar da û gera ku ji bo Tirkiyê betal dibe, bi heman bihayî ji bo welatê din organîze kirin. Li ser vê Tirkiye kete hewldanê ku pêşiya ve kêşeyê bibire. Lê hemû hewldanên Tirkiyê bi avê de çûn

Di encamê de li gorî salên berê ji sedî 30'yê tûrîstên tirk çûne welatên Ewropayê. Hema bêje di Cejna Qurbanê de li

dora 80 û 100 hezar kes çû Ewropayê. Li gorî texmînen pisporan di demeke nêzik de ev hejmar dê bigihêje 150 hezarî û dawîya salê jî dê ji 500 hezarî derbas bibe. Li gorî berpirsiyarê 'Vip Turizm Dış Turlar' Serdar Gören, di Cejna Qurbanê de ji van ji sedî 30 kes çûye derveyî welêt. Ev kapasîteyê mezîne. Li gorî Mudurê Giştî yê Duru Turizmê Yusuf Duru jî di salekê de 500 hezar kes ji bo gerê diçe derveyî Welêt. Lê bi qasî ku xuya dibe îsal ev hejmar dê hê jî zêde bibe.

Li ser van bûyerên ku diqewimin xwediyên tesîs û saziyên tûrîzmê behtir qehirîne. Ji bo vê dixwazin dewlet tekeve nava hewldanan û wan ji nava tengasiyê bifilitîne. Devletê jî di heman demê de dest bi kampanyayên navneteweyî kir. Li aliyekî îlanên li ser bedewî û xweşikîya Tirkiyê dan, li aliyekî karê lobiye meşandin û li aliyê din jî riyên bertilê vekirin û gotin ku ji bo berjewendîyan hemû rê meşrû ne.

Lê kampanyaya taybetî ne ji bo teşwîqa tûrîzmê bû. Dewletê behtir Pîrşîrêka Kurdî xiste rojê kampanyayê. Li gorî vê, "Li Tirkiyê Pîrşîrêka Kurdî tune ye. PKK jî qediyaye. Bila kesek ji teqîna bombeyan netirse û tekeve behrê, bigere û bêhn vede." Lê di serî de Almanya hema bêje tevaya dewletan diyar kir ku "Tirkiye herêma ser e. Kî biçê berpirsiyariya wî-wê hîlnagirin ser xwe." Pey ve daxuyaniyê jî gelên ewropayî lingê xwe bi temamî li çûna Tirkiyê birîn.

Bi vî awayî tê nirxandin ku hewldan û tevgera Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji Tirkiyê re ji bilî fatûraya siyasî fatûra-

yeke aborî a giran derxistiye. Gava ku Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan çû Îtalyayê Tirkiyê ambargo danî li ser malê Îtalyayê û di dawiyê de zerareke mezîne dît. Lê bi qasî ku xuya dibe ligelê ve xesarete qeyrana tekstîl, însaat û her wiha qeyrana aboriyê ya gelemperî ya cihanê dê giraniya xwe bide der. Her çiqas di serê salê de hînbîstêk derketibe holê jî dê ber bi nivê havîne bandora xwe berbiçavtir bike.

Divê karkerên kurd refên xwe diyar bikin

Di sektora tûrîzme de piraniya karkeran kurd in. Ev karker bi piranî bi zend û bendên xwe dixebitin, nekarkerên teknîkî ne. Garsonî, paqijkarî, barkêşî û karên din yên li ser milan dikin. Li gorî xebatkaran wergerê an teknîkî kêr jî destmîzê distînin. Xeynî ve sigorta an jî hêzeke ku wan biparêze tune ye. Ji ber vê xwediyên kargehan çi wextî dilê wan bixwaze dikarin wan ji kar biavêjin. Karker li hemberî van biryaran stûxwar û bêdeng in.

Bes gurbûna berxwedana gel, di hîlbijartinê de serkeftina nijadperestan refan zelaltir dike. Ji ber vê bo karkerên kurd refgirtin pêwîstir dibe. Hem jî hêla çimî û hem jî ji hêla neteweyî ve dê bi lez hişê xwe bidine serê xwe û helwesta xwe diyar bikin. Eger vê yekê nekin ji bo jiyane tu rê li ber wan namîne. Li aliyekî destengîya aborî ber bi birçibûnê ve dibe, li aliyê din jî êrişên nijadperest qet mafê jiyane nade wan. Welatê biyanî jî dê notî berê kurdan wekî penaber nepejirînin.

Qertafên kurdî bes in

Di hejmara 162'an a Azadiya Welat, rûpel 5 de di bin sernavê "Hinek qertafên kurdî" de nivîsek ji S. Berbang ve hatiye nivîsandin. Di wê nivîsê de di nav qertafan de /-ayetî/ jî cih girîye. Li ser wê qertafê jî hinek mînak hatine dayin. Ji wan mînanan ji bilî "mîrovayeti"yê (zimandirêjan em hînî wê peyvê kirine) mînakên "birayeti, kurdayeti" ku li gorî dîtina min seyr in. Rastiya wan her du bêjeyan "biratî, mirovahî, mirovati" ye. Parkî (paşgir) li gorî tîpa dawî dirûv digire. Divê ez bidim xuyakirin ku dema min ev yek dît ez ketim bêhêviyeke mezin, min got çawa kêmasiyeke wiha hatiye kirin û qertafa erebî mîna qertafeke kurdî hatiye pejirandin.

Ev kêmasî ne tenê di Azadiya Welat

de di hinek cihên din de jî hatiye dubarekirin. D. Îzolî ev paşgir mîna paşgireke kurmançî di ferhenga xwe de bi cih kirîye. Birêz Mîrhem Yîgît jî di pirtûka xwe ya bi navê "Helwest" de cih daye peyvên bi parkîyên mîna /-ayet/, /ayet-î/, /-ayetiye/. Wekî mînak: Kurdayeti, serokatî, serokatîyat û hwd. bi kar anîne. Osman Aytar jî navê pirtûka xwe daniye "Kurdîstana fiftî-fiftî" ew jî çewtiyek e. Heta di klasîkên kurdî de jî ev helwesta çewt balê dikîşîne. Bo nimûne, Ehmedê Xanî dibêje "Da xelqî nebêjîtin E-krad/ Bê marîfet in, bê esl û binyad in." Lê wî ew peyv di nava dunikan de daye. Celadet Bedirxan jî di rêzimana kurmançî de du peyvên bi qertafên tirkî bi kar anîne. Wekî qewçî, deveçî... Ez nizamî Mîr Cela-

det bi çî mebest û ramanê xwedî li wan qertafan derketiye.

Spîkerên MED-TV'yê jî di bin bandora wan de mane, gelek peyvên çewt bi lêv dikin. Berî niha bi çend mehan min li ser wê mijarê nivîsek ji Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê re şandibû û min dabû zanîn ku ev qertaf ne bi kurmançî ye, bi erebî ye. Wekî mînak Cumhuriyet, milliyet, hürriyet, şexsiyet, insanîyet, cemiyet, hidayet, cinayet û hwd.

Eşkere ye ku qertafên zimanê kurdî gelek in û têrî me dikin. Ji bilî peyvên hevedudanî nêzî 60 paşgir di pirtûka rêzîman a Mîr Celadet Bedirxan û 80 jî di ferhenga D. Îzolî de hene. Ma qey yek ji wan li peyva kurdî nehat ku we paşgira zimanê erebî bi kar aniye? Ehmedê Xanî

kurmançî, kurmançîti bi kar aniye. Gotiye "bifîkr ji ereb heta ve gurcan/ Kurmançî ye bûye sibhê bircan" (Mem û Zîn, rûpel:56)

Di hejmareke Azadiya Welat de bi birêz Mahmut Baksi re hevpeyvînek hatibû kirin. Di wê hevpeyvîne de birêz Baksi "kurdewar, kurdewarî" bi kar aniye. Binêrin çiqas peyveke xweş û watedar e. Li ser wê mirov dikare çend mînakên din jî bide: Cemawer, bendewar, bîrewer... Dema em peyva bendewarî dahûrînin, kurdewarîbûna wê darî çavan dibe: Bend-e-war-î ango ji bend bi qertafa /e/ bende ji bende bi qertafa /war/ bendewar û ji bendewar jî bi alikariya qertafa /î/ bendewarî pêk tê.

Nivîskar ji rêzîmanê ne berpirs in, ji wan re rêzîman ev çend ne girîng e; zîman jî. Ev bar dikeve ser milên pisporên rêzîman û rastnivîsa kurdî. Lewre jî divê ew gelekî hişyar û baldar bin.

BRO OMERÎ

Rastkirina çend çewtiyan

Her çiqas ez ne zimanzan bim jî, çend xalên ku bala min kişandine ez li gorî zanebûna xwe rave dikim. Spîkerên MED-TV'yê û çend nivîskarên me hinek biwêjî bêjeyan çewt bi kar tînin. Wek mînak:

Kujer: Bi wateya kujyar dixebitînin. Di rastiya xwe de kujer tiştê ku dikare bikuje ye. Mînak derbeyeke kujer, nexweşiyeke kujer û hwd.

Kujyar: Kesê ku mirov kuştîye ango mêr kuştîye ango qatîl e.

Kiryar: Kirde, faîl e. Ne lêker ango kirin e. Lê hin kes di cihê kirinê de bi kar tînin. Mînak: Celalettin Yöyler, A. Welat, hej.5 "kiryarên çaşîk û keran qet nakevin pirtûk û defteran..." Ji bilî wê nivîsê di nivîsên hejmar 95 û

108 de jî diyar dibe ku ew di cihê "kirin"ê de hatiye bikaranîn. Lê ew yek ne di cihê xwe de ye. Spîkerên MED-TV'yê heman peyv gelek caran di heman wateyê de bi kar aniye.

Beyar: necotkirî (bêyar, bêxwedî) ji layê nivîskarên ve gelek caran bi maneya bejî hatiye bikaranîn.

Xalê çê: Bi baweriya min ev biwêjî di kurmançî de tunebû. Birêz Mîrhem Yîgît di pirtûka xwe ya bi navê Helwest de ji dêla "mêrê çê" de bi kar aniye.

-iyet: ne kurdî ye. Paşgireke bi erebî ye. Lê Mîrhem di heman pirtûkê de bi bêjeyên kurmançî ve zeliqandiye. Mînak: Kurdatiyet, kesatiyet, serokatîyet...

Bêjeyên ku di ferhenga D. Îzolî de çewt hatine ravekirin

Brûsk: Ev peyv di wateya beledî (şimşek) de ye, lê wekî bilêç (berq) hatiye ravekirin.

Balîfamêr: Marmaroka girs e. Îzolî jê re salyangoz

(şeytanok) gotiye.

Betan: facia ye. Îzolî tendon (kiriş) nivîsandiye.

Hît: Îzolî "tiftik keçisi" nivîsandiye, lê bizina mû ye.

Qûş: Seneda paş kurtan e, lê Îzolî wekî navteng rave kiriye.

Şalik: qaçilê dora liba nok, nîsk û kizinê ye. Lê Îzolî gotiye nîsk, nok şîn

Şikêr: koma kevîran e (bi piranî li nava rez û zeviyan in). Heta mamoste Cîgerxwîn di helbesteke xwe de wiha dibêje: "Yek yek dizîn ew zinar û kelem/ şikeftê mezîn, şikêrek li cem. Lê Îzolî gotiye, zinarên li çiya.

Rijî: bêrûn, bêdon e. Lê Îzolî wekî "tisi" rave kiriye.

Şixre: Amûrekî sapkişandinê ye, lê Îzolî gotiye sapkişandin.

Xirtik: Difterî (kuşpalazî) ye. Îzolî gotiye "boğmaca".

Iknma: birhdan e, Îzolî çewt rave kiriye.

Kızıl: soring e, Îzolî wekî mēkutok rave kiriye.

BRO OMERÎ

Zelal bû

NEJDET BULDAN



E-mail: oramarbuldan@online.de

Hilbijartin xilas bû. Li Tirkîyeyê du partiyên nîjadperest bûn xudanê dengên zêde. DSP û MHP. Raya giştî yekê (DSP) bi şovenîtiya çep, a din (MHP) jî bi xwînmîjîyê nas dike. Eşkera ye ku desthilatiya Tirkîyeyê kete destê şovenîstan. Nayê wê wateyê ku partiyên din bûna çêtir bû.

Dîsa zelal bû ku dewleta Tirk gihîştê armanca xwe. Ji bo ku HADEP nekeve meclîsa wan. Di nûner karnekirina HADEP'ê de tenê astengiyên dewletê ne sedem in. Li hemberî hemû êrişên dewletê, heke kurdan deng bidana xwe bawer dikim ku HADEP jî dê biçûya meclîsê. Bi kêmasî be jî cihên di nava agir û şer de weltparêziya xwe eşkera kir. Bi piranî bajarên nêzîkî Tirkîyeyê û kesên di bajarên tirkî de dijîn qîmeta hilbijartinan nezanî. Mixabin dîsa ev firsend derdan. Niha bi dengên kurdan dîsa nijde, serokçeş û xwefiroş dibin nûner. Hat zanîn ku li hemberî hemû astengiyên HADEP'ê ji sih nûnerî zêdetir bidest xist. Neçûyîna wan ya Meclîsa Tirk rûreşîya Dewleta Tirk e.

Li gorî encamên hilbijartinan tiştê din ê balkêş jî zelal bû. Di hilbijartinên 95'an, yekgirtineke aştî û demokrasîyê hatibû çekirin. Hevgirtineke birêz bû, pîroz bû. Di wê hilbijartinê de ew partiyên dema berê yekgirtin bi HADEP'ê re çekiribûn, serbixwe ketin hilbijartinan. Wan digot: "HADEP bi dengên me encama 95'an wergirtibû. Lê tu caran qala me nehatiye kirin..." Niha em di encama hilbijartinan de dibînin ku tu quwet û hêza wan partiyên tunebûye. Gişt nebûn xudanê pûanekê. HADEP'ê hem nîsbetî belaviya wan û hem jî li hemberî hemû aloziyên dewletê hejmara xwe parast. Ne tenê parast, zêde kir. Ji bo giştîya Tirkîyeyê bi ser keft. Ji niha şûn de pêwîst e ku her partî li gorî quweta xwe biaxive. Lê dîsa ji bo siyaseteke legal li Tirkîyê pêwîst e ku partiyên li ser navê kurdan dixebitin, bèn cem hev.

Encama herî mezin jî belediye û nûnerîyên din ên herêmî ne. Dema ev nivîs dihate nivîsîn, hemû encam zelal nebûn. Lê dîsa aşkera ye ku bi kêmasî şeş bajarên (Amed, Sêrt, Çewlik, Batman, Wan û Culemêrg) kurdan û gelek navçe (ji sihan pêtir) niha di destê HADEP'ê de ne. Nûnerîtiya meclîsa bajarên jî girîng e. (Tirk dibêjinê İl Genel Meclisi) Eve encameke nû û dîrokî ye.

Ji roja ku Dewleta Tirk hatiye damezrandin heya niha bûyereke siyasî ya wisa çênebûye. Bi rastî jî ew nûnerên gelê xwe ne. Û piraniya wan jî ji nivî bêhtir bi dengên

bajarên xwe hatine hilbijartin. Dewleta Tirk jî dixwest ku di sîstema hilbijartinên herêmî de guhartineke wisa çêke. Ew guhartin bi destê gelê kurd hate çekirin. Erê em dizanin ku astengiyên pêşiya wan jî mezin in. Mîna ambargoyên aborî, êrişên madî û manewî. Dîsa jî em bawer dikin ku ewê wezîfeyên xwe bi serbilindî cih bînin. Ji bo wê jî wezîfeyê mezin dikeve ser milên bajarîyên wan, hemwelatîyên wan. Ew pêwîstiyên ji serokên belediyyan ên partiyên din tînin xwestin, ji van serokan nayê xwestin.

Di qada navneteweyî jî bandora wê dê zêde bibe. Lê heke ew serokên me yên belediyyan bi rêxistin û sazî bin. Heke sazîyên me yên li derveyî welat xwe bizanin. Bi giştî Tirkîyeyê nijdên xwe paqij kirin û desthilatdariya wan bi fermî bû. Ji kêşeya kurd re rojên pêşiya me dê çawa be, em nizanin. Mirov her du serokên partiyên mezin dibîne, hêviyên mirov aloz dibin. Bajarên Kurdistanê jî van hêviyan geş dikin. Ji ber ku meclîsên belediyan û meclîsên bajarên li ser jiyana bajarên xudan erk in.

Desthilatdariya nû ya bajarên Kurdistanê li gelê me, Serokatiya belediyyan li serokbelediyyan pîroz be.

Hûn ne tenê serokên av, rê û pira ne. Hûn hêviya pêşeroja me ne.

Dibe ku xebata we li ser qedera me jî bandoreke baş çêke.

Hefadê Çiyayê Tûrcelê:

Pîro Ecer

Pîro Ecer ji wekî gelek kurdan di rojêke tîji kul û keser de, di sala 1965'an de li gundê Mavanê bi ser Derikê Çiyayê Mazî ve ji dayik bûye. Jiyana wî, heta van salên dawîn jî li gund û li navçeya Dêrikê derbas bûye. Wî jî ew agirê ku li welatê wî pêketibû, giş bi çavên serê xwe didît û dijiya. Her ku şerek an şahiyek li dor gundê wan û navçeya wan çêdibû, wî jî di bedena xwe de ew hîs dikir. Dorpêçkirina bandora şer û serhildanên gel, ew jî pir zexm kiribû. Ewqas zexm kiribû ku êdî dikaribû ji bo welatê xwe, ji bo rêberê xwe her kesî bişewitîne û êgir bi bedena xwe bixe. Û wî jî ew kir.

Dîsa hîsên wî ewqas geş bûbûn ku, dikaribû xwe tevî zarokên xwe bişewitîne. Beriya ku xwe bişewitîne ji qîza xwe Ronahî re dibêje: "Qîza min ka ez û tu em xwe bişewitînin!"

Belê... Wan rojên ku her kesê kurd ê bi xîret di nava xwe de tengjîbû û her kesî dixwest papûçka xwe deyne ser xebat û serhildanê. Her kesî ji her kesî dipirsî: "Em çi bikin?" "Serok hatiye girtin. Ma hê heta kengî?"

Pîro jî li dora xwe dinihêrî, wî jî hewl dida ku deng bilind bibin. Li her derê agir, li her derê qêrîn, li her derê bombe, li her derê meş û bazdan... Lê li dora mala wan tiştê tunebû. Jixwe vê yekê ew qehr dikir û ew ber bi teqînê

ve dibir. Di dilê xwe de wî digot: "Çawa mirov wiha bêdeng dimîne! Çima ev mirov li malên xwe rûniştine?" Li mirovên Taxa Çay a Mêrsînê ecêbmayî dima. Taxa ku berê bi nav û deng bû, çi pê hatibû? Di rojên serî de wî hinek xort û zarok dan dora xwe û agir li taxê pêxist. Lê qet ne bi dilê wî jî bû û dilê wî rehat nedikir. Ji kê dipirsî gişan digot: "Em nizanin, em dê çi bikin? Em şaş bûne!" Lê wî zanibû dê çi bikin: Serhildan. Ji ber wê yekê jî cudahiyeke mezin di nava hişê wî û mirovên taxê de çêbûbû.

Sebra wî nema ku ewqas serhildan dereng bikeve. Biryara xwe dabû: "Divê ez bibim Mazlûm!" Êdî amadekariya agirê ku di bedena xwe de bike Newroz dikir. Li malê wekî ku temenê xwe qedandibe tevdiqeriya. Deynê dikandaran giş dabûn û temî li zarokên xwe, jina xwe û çiranên xwe dikirin.

Zarokên xwe: Leyla, Ronahî, Zana û Nalîn li dora xwe kom dikirin, tevî diya wan. Bi hev re stran digotin, dûrişme hildidan.


Malbata wî pê hesiyabûn ku dê Pîro çalakiyeke pêk bîne. Lê nizanibû ku wê bedena xwe bike agir. Wan jê re digot: "Hinekî bi sebir be! Ka derdora me çi bike. Em jî wiha bikin?" Lê wî digot: "Na. Divê her kes xwe berpirs bibîne û bi xwe tiştê bike. Kes li benda kesî

nemîne. Her kes peywi-rekê hilde ser milên xwe."

Roja 25'ê Reşemiyê bi erebeya xwe berê xwe da sükê. Cara dawî li mala xwe nihêribû, li zarokên xwe nihêribû. Zarokên wî jî amadekariya şahiyê bûkê dikirin ku herinê. Wî jî amadekariya çuyinekê dikir. Bîdonek benzîn jî peyda kiribû. Êdî veqer tunebû.

Bi erebeya xwe di ber dikana ku her roj tê re derbas dibû, buhurî. Bi lez dîsa veqeriya. Benzîn derxist û agir gur kir. Dikandar bi pelê silkan hewl da, ku êgir vemirîne lê ew dixeyîdî. Agirê ku li erdê veketibû, wî jî xwe li nava agirî diavêtê erdê.

Agir vemirî bû, ew jî xedar birîn bûbû. Pêşî ew birin nava bexçeyê porteqalan. Derdora wî, malbata wî pê nehesiyabû. Pîro jî derdora xwe re digot: "Min nebin nexweşxaneyê. Tu tiştî bi min nehatiye." Biribûn nexweşxaneyê. Lê tu sude jê re çenebû. Her ku diçû birînên wî xedar dibûn. Ji ber wê yekê jî rakirin Enqereyê. Lê ew jî bi kêr nehat



û roja 12 adarê jiyana xwe ji dest da.

Wê rojê çiyayê ku wî hefadî (parêzkari) jê re dikir, Çiyayê Tûrcelê û Çiyayê Mazî gişan bejna xwe tewandibû. Pîro jî wekî şehîdên din bi termê xwe jî, tirsek pir mezin xiste dilê neyaran. Wê rojê kolanê Dêrikê mişt tîji leşker bûbûn. Ew jî êdî bûye çirûskeke ji çirûskên tavê û welatê xwe ronî dîke, li nêzî Kaniya Xabê.

ÇIYA MAZÎ

Bavê "Faîlî Meçhûl'ekî":


Di nava nivînên xwe de hate kuştin

Murat Akman, roja 21 rêbendanê sala 1997'an de li Stewrê, li mala xwe, di nava nivînên xwe de hate kuştin. Lê mêrkujên wî, li kolan û kuçeyan xwe li ba dikin. Malbata Akman berî niha bi 8 salan, ji ber ku ji bo cerdevantiyê zor lê hate kirin, ji gundê Dengizê koçî navenda Stewrê (Savur) kir.

Roja 21 rêbendanê sala 1997'an de li Stewrê, 10 şevê di nava gerîla û leşkerên tirk de şerekî rû da. Vî şerî heta 6 sibehê berdewam kir. Di encama vî şerî de polîs û leşkerek hate kuştin. Piştî vî şerî leşkerên tirk berê xwe da malan. Yek ji van malan, mala bavê Murat Akman Faysal Akman bû. Di vî navê de leşkeran li ber çavê Faysal Akman lawê wî Murat Akman, di nava nivîna wî de gulebaran kir. Akman bavê du zarokan bû.

Piştî vî bûyerê, bavê Murat Akman serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê da. Doza Akman hîna jî didome. Me li ser jiyana û kesayetiya Murat Akman û bûyerê ligel bavê wî Faysal Akman kurtehevpeyvînek pêk anî.

Hûn dikarin hinekî behsa Murat



Akman bikin? Têkiliya wî û têkoşînê çawa bû?

Murat li derdorê bi duristî û welatparêziya xwe dihate nasîn. Wî, hez ji gelê xwe dikir. Ew, li dijî şerê qirêj, ku KT'ê dida meşandin, bû. Murat, tu caran nedixwest dayik bigirîn.

Baş e. Murat Akman çima bû hedefê dewletê?

Ji ber ku hez ji gelê xwe dikir.


Hûn dikarin hinekî din li ser kuştina wî me agahdar bikin?

Berî bûyerê bi 3 mehan, ji şubeya leşkeriyê bo wî tebligat hate şandin û ji wî daxwaza çuyina leşkeriyê hate kirin. Lê lawê min leşkeriya xwe kiribû. Di vî tebligatê dihate gotin ku, ji bo kutabûna leşkeriya wî 13 roj mane.

Berî vî bûyerê tiştêkî bi vî rengî hatibû serê wî?

Na. Lê bûyerên bi rengî gelekî qewimîn û diqewimin. Lê tu bûyer, wekî kuştina Murat li ber çavan û êşkere nehatibû kirin. Ev jî qirêjiya şerê li Kurdistanê dide xuyakirin.

HALUK BAZ



Nursel Ülgen

Dilteng mebe
Rojek tê vedigerî
Ku veqeriya jî
Niştimana te ji kokê radibe
Hembêza xwe ji te re
vedike
Wek diya te
Tê pêşiya te

Evdillah Pêşew

Li ser navê malbata wê Bêrivan,
Şilan Ülgen

Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Îzmirê

● 24.04.1999 şemî

Roja Xwarinên Kurdî ya Kevneşopî ya 31'ê

Koma Amed saet: 17:00

● 25.04.1999 yekşem

Konsera Koma Amed seansa yekem saet: 15:00, seansa duyem

saet: 18:00

● 28.04.1999 çarşem Konferans: "Tekoşîna Sendîkayan û 1 gulan"

Beşdar: Faysal Özçift (Endamê MYK'ê ya KESK'ê)

ÇALAKIYÊN HEFTYÎ



YÇKM

● 24.04.1999 şemî

Konsera Koma Rojhilat

saet: 18:30

● 25.04.1999 Yekşem


Film: Li ser erdê bi xêr û bêr

Derhêner: Erdal Kiral

● 28.04.1999 Çarşem

Film: Bi guran re dans, derhêner: Kevin Costner

ÇAVDÊRÎ



Mensûbiyeta romanê

MİRHEM YIĞIT

Haşim Ehmedzade ji rojhilatê welêt e. Li bajarê Upsala rûdine û yek ji çend kesan e ku li ser dabaşên edebiyatê şareza û bi kapasîte ye.

Heftaya bihurî li Înstîtuya me birêz Haşim li ser "teoriya romanê" semînerê da. Ev semîner dê di mehên pêşîya me de bi du semînerên din bê temamkirin. Ew jî "Roman li Rojhilata Navîn" û "Roman li Kurdistanê" ne.

Em di destpêka karê edebiyatê de ne. Di vê eniyê de jî em dereng mane, keleş û sermayeya heye jî qels e, sererû ne xurt e.

Ji bo ku em karibin rewşa xwe binixînin, asta xwe nas bikin, cihê me li ku ye, di vî alî de pirsgirêkên me çi ne, agahdarbûna li ser hinek pîvan, qeyde û qaîdeyên edebî, ji bo me jî mercên sereke ne.

Mîna her şaxî li vir jî bingeş û pêzanîneke fikrî, akademîkî, kitêbî tê xwestin. Di vê semînerê de Haşim hewl da ku bersiva vê daxwazê bide. Di beşa nîqaşê de her çendî dê di semînerên piştê de bi firehî bibe yek ji xalên navendî, çend deqîqe be jî berê gotinê kete ser mensûbiyeta romanê. Fikir bi giştî ew bû ku tiştê romanekê dike romana filan neteweyî yan neteweyê din, ziman e. Roman bi kîjan zimanî hati-be nivîsandin, li ser wî zimanî tê hesabkirin. Romana bi tirkî di beşa tirkî de ye, erebî di nav berhemên erebî de û ya bi kurdî jî di nav refên kurdî de tê bicihkirin. Gava tu diçî kitêbxaneyekê û li berhemekê dipirsî yan jî lê digerî ziman e tiştê ku rêpêşandariyê dike. Otorîteyên di vî warî de jî ziman ji bo mensûbiyeta berhemekê wekî faktorê ewil qebûl dikin. Lê bi vê tesbîtê re divê hejmarek tiştên din bêne gotin:

1- Însan, bi giştî û xwendê bi taybetî di bin bandora duh de ne. Herkes hindik gelek bi nirxandin, tarîf û tesbîtan sal û sedsalên bihurî re barkirî ye. Tarîfa romanê û tesbîta ku mensûbiyeta romanê bi tenê bi ziman ve girê dide berê qonaxekê ye. Jiyana di tarîf û tesbîtan de berdewam hîlnayê û tim tiştêkî li derve dimîne heye.

2- Şeît û welatê tarîf li wir çêbûye û ev tesbît lê hatiye kirin, xweser û diyar e, wek realîteyêke neteweyî bisinor e, tê de bivê nevé kêmasiyek dimîne.

3- Em kurd neteweyêke çend zimanî ne. Neteweyêke wekî neteweya kurd bi kurdî û tirkî, kurdî û farisî, kurdî û erebî û heta kurdî û rûsî, ewqas ziman bi hev re zanibe tune. Ev jî sebeba sereke ye ku bi sedan û belkî hê zêdetir nivîskar, zana, siyasetmedar û welatparêzên me ne, bi zimanê dayika xwe belê bi zimanê neteweyêke jî neteweyên serdest û dagirker an jî bi zimanekî ewrûpî dinivîsin.

4- Di dawiyê de mirov dikare nivîskarên esil kurd bike çend kategorî:

a) Kategorîya ku di berhemên wê/wî de qet pêjin û bêhneke kurdî tune û ne xwediyê paxavekê ne ku tükiliya wê/wî bi kurdayetiyê re hebe.

b) Kategorîya ku di berhemên wan de mebest -li vir berhemên edebî ne—hînavên bi kurdî hene û ne xwediyê derdekî neteweyî ne.

c) Kategorîya sêyem ku giş berhemên wan neteweyî ne, tişî mesaj in, bi mebestên ronîkirin, hişyarkirin û organîzekirina kurdan hatine pê û ji ber wê jî di nav zimanên ku bi wan hatiye nivîsandin de cih digirin.

Bi baweriya min dema em mensûbiyeta berhemên edebî nîqaş dikin, divê em van çend xalan jî li ber çavan bigirin.

Li Stenbolê Mîhrîcana fîlman a Navneteweyî

18'mîn Mîhrîcana (Festîval) Fîlman a Navneteweyî ya Stenbolê di 16'ê avrêlê de li Sînemaya E-mekê bi axaftina Serokê ÎKSV'ê (Îstanbul Kültür ve Sanat Vakfı) dest pê kir.

Festîval bi organîzekirina Weqfa Huner û Çandê ya Stenbolê (ISKV) tê birêvebirin û wê di navbera 17'yê avrêlê û 2'yê gulanê de bidome. Îsal ji 35 welatan dora sed û pêncî heb film tevî festîvalê dibin. Ev festîval her sal di destpêkê de xelatan dide kesên ku ji bo pêşketin, girseyîbûn û rêxistinbûna sînemaya tirkî dixebitin. Îsal ji ber ku keda wan di sînemaya tirkî de çêbûye, listikvan Neriman Köksal, derhêner Ertem Güneş, nivîskar Vedat Türkali û filmsaz (Yapımcı) Türker İnanoğlu hêjayî xelata "Rûmeta Sînemayê" hatin dîtin û wan di roja vebûna festîvalê de xelata xwe girt. Li dû xelatdayînê festî-

maz Güney bi filmê xwe yê "Seyîdxan" di sala 1969'an de xelata "Listikvanê Herî Baş yê Mêr" stendibû. Dîsa di sala 1970'yê de jî bi filmê xwe yê "Hêvî" xelata "Jûriya Festîvala Edene"yê girtibû. Ji bilî Yılmaz Güney filmên Abbas Kiarostamî, Mario Monicelli û hwd. tî nîşandayîn.

Her wiha digel van herdu beşan gelek beşên din jî di festîvalê de cih digirin. Çend heb ji wan ev in: "Ciwanên Binavûdeng ên Sînemaya Cihanê", "Ji Festîvalên Dinê Çend Film" û hwd.



Di beşa "Welatek û Sînemayek" de ku ev beş kîrîne kevneşopî îsal cih dane filmên Spanyayê. Bi taybetî filmên Spanyayê yên ku di sala 1997-98'an de hatine çêkirin, cihê xwe di festîvalê de girtine.

Di beşa sînemaya tirkî de filmên ku bal a mirov dikişînin jî hene. Di vê beşê de çend heb ji wan fîlman ev in: "Gemide", "Yara" "Kaçıklık Diplomasisi", "Hoşçakal Yarın", "Propaganda", "Leoparın Kuyruğu", "Laleli de Bir Azize", "Kayıkcı", "Karanlıkta Uyanlar", "Her Şey Çok Güzel Olacak" û "Güneşe Yolculuk" in. "Güneşe Yolculuk" di nav van de ya herî balkêş e û "Xelata Aştiyê", "Xelata Hêşin a Firîşte"yê stendiye. Ev film ji aliyê Yeşim Ustaoglu ve hatiye çêkirin û listikvanên wê jî Newroz şahin, Nazmi Kırık û Mizgîn Kapazan in. Ev listikvan xebatkarên Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) yê, beşa sînemayê ne. Film, li ser tükiliya du xortên ku ji Anatolî û Kurdistanê hatine Stenbolê, hatiye honandin. Bi kinahî jiyana wan a li Stenbolê radixe ber çavan.

Di festîvalê de 12 film ji bo xelata "Laleya Zer" bi hev re ketine pêşbaziyê.

SERWİSA ÇANDÊ

valê bi filma "Tango" yê perdeyê xwe ji te-maşevanan re vekir.

Her wiha festîval ji bo hinek fîlman du beşên taybet vediqetîne. Yek: Ji bo bîranîna "Hostayên ku jiyana xwe ji dest daye." Di vê beşê de filmên wan tene pêşkêşkirin û beşa din jî ji bo "Ji Hosteyan re Hurmet"ê tê veqetandin. Di festîvala îsal, beşa "Bîranîne" de Alfred Hitchcock bi 16 filmên wî tê bibîranîn. Ji bilî Hitchcock derhênerên navdar ên wekî: Akîra Kurosawa bi filmê wî yê "Raşomon", ji bo bîranîna Alan J. Pakula jî filmê wî yê bi navê "Hemû zîlamên Serok" tî nîşandayîn.

Dîsa di beşa "Ji Hosteyan re Hurmet" de filmên Yılmaz Güney jî cih digirin. Filmên Güney ku dê bêne nîşandayîn ev in: Seyîtxan, Gurên Birçî û Hêvî. Wekî tê zanîn Yılmaz

Nivîskar û zimanzan A

Em dê di demeke kurt de li Amedê

Kurdan qedexeya li ser kurdî li aliyekî, ji bo ku bi zimanê xwe peyvîn, "pere" dane dewleta tirk. Dema behsa zimanê kurdî dibe, mûyê serê rayedarên dewletê dibin şû-jin. Vê dawiyê berdevkên dewletê, dîsa bi dûvikê propagandaya "bi zimanê kurdî perwerdehiya naçe serî" girtiye. Lê ev ji 20 salan zêdetir e, li Swêdê, ku gelek kurdan navê wê nebihistiye, kurd li dibistanan hîn zimanê xwe dibin. Tiştê herî balkêşt û ecêb, dema li dibistanê zarokêk bi tenê hebe jî, mamoste wî/wê hînî kurdî dikin...!

Nûnerê me yê Swêdê **ŞOREŞ REŞÎ** li ser dîroka perwerdehiya li Swêdê û naveroka wê, girîngiya zimanê zikmakî, helwesta malbatên kurd ligel Amed Tigrîs hevpeyvînek pêkanî.

Wekî em pê dizanin, we heta niha gelek pirtûk nivîsîne an jî wergerandîne. Hûn dikarin hinekî behs bikin?

Belê. Ez dikarim wan berheman wiha bi nav û rêz bikim. Berhemên ku beşek jê min û çend kesên din bi hev re nivîsandine an jî wergerandine: "Em Bixwînin 1-2, Em Binivîsin, Kurterastî, Dîroka Kurdistanê, Cografya Kurdistanê, Şerê Kendavê û Kurd, Ken û Girîn." Wergerên ku min bi xwe an jî bi kolektîv kirine: Pirtûka İsmail Beşikçi Çend Gotin li Ser Ronakbîrên Kurd (min û J. Eşpar), pirtûka Abdullah Öcalan a Ji Sedsala 19. Heya İro Rastiya Kurdistan û Tevgera PKK'ê. Wergerên ku min bi xwe kirine: Çelenga Jinan Hevala Zilan, Pirtûka Abdullah Öcalan a bi navê Perspektîv, ya Leo Tolstoy a bi navê Du Heval in. Yên ku min bi xwe nivîsîne: Nîşan û Dawetên Kurdî, Navên Kurdî, PKK û Başûrê Biçûk in.

Birêz Tigrîs, her çend kurd li welatê xwe li sê parçeyan, ji mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî bêpar in jî, ev ji 20 salan zêdetir e ku li Swêdê bi zimanê xwe perwerde dibin. Hûn dikarin wekî mamosteyekî zimanê kurdî, dîroka wê perwerdehiyê bidin xuyakirin?

Dî sala 1984'an de min dest bi mamostetiya kurdî kir. Wekî min di serî de jî got, ez li welatê mamoste bûm, lê ne mamosteyê kurdî, yê tirkî bûm. Ji ber ku karê min mamostetî bû, wê demê bi tenê pirsê zimên dima û min bi kurdî jî dizanibû. Sistema Swêdê, di sala 1977'an de dest bi perwerdehiya bi zimanê zikmakî kiribû. Ew komên biyanîyên ku li Swêdê dijîyan, bi qanûnî mafê wan çêbû, ku zarokên wan jî di dibistanên swêdî de hîn zimanê xwe jî bibin. Lê, bi şertekê ku dê û bavên wan bixwazin û di wî warî de serî li birêve-

beriya dibistanê bidin. Kurdan jî di wan salan de dest bi perwerde û hînbûna zimanê zikmakî kiriye. Lê wê demê li Swêdê kurd gelek kêmbûn. Bi tenê li herêma Stockholmê çend zarokên kurdan diçûn dersên zimanê zikmakî. Piştî Cûntaya 1980'yî ku kurd hatin Swêdê, mamostetiya kurdî jî dest pê kir. Ji bo ku kesek bikaribe li Swêdê mamosteti-

Swêd ji bo ku Tirkiyeyê perçe bike, alîkariya kurdên wê derê dike. Di warê perwerde û zimanê zikmakî de dewleta Swêdê ferq dixê navbera zimanê kurdî an mamosteyên kurdî û yê din?

Tiştêkî wiha tune. Li Swêdê mafê zimanê zikmakî qanûnî ye û bi tenê ne ji bo komeke biyanî ye, ji bo hemû grûbên biyanî (tirk, faris, ereb hwd.)

Bêguman li derveyî welatê sîda perwerdehiya zimanê zikmakî gelek e, lê ya herî girîng perwerdehiya li ser axa welatê e. Ez bawer û hêvîdar im, ku di demeke gelek kurt de, em dê li Amedê dest bi perwerdehiya kurdî bikin.

ya kurdî bike, du şert diviyan: Yek; divê mirov li welatê xwe mamoste be û bi qasî çend salan mamostetiye bike û heger karê mamostetiye hebe, kesên wiha dikarin mamostetiya kurdî bikin. Ya duyem; demê li Swêdê di dibistana mamostetiya Swêdê de beşa kurdî hebû. Dibistanê du caran mezûn da û piştê hate girtin. Niha ne bi tenê ji bo mamosteyên kurd, her wiha ji bo hemû komên biyanî dibistanên mamostetiye tune.

Carina rayedarên Tirkiyeyê dibêjin,

derbas dibe. Ji bo kurdan jî wiha ye. Li Swêdê, ev maf ji bo kurd û tirkan eynî ye. Lê, li Swêdê ji derî zimanê zikmakî qanûneke din heye. Dewleta Swêdê mafêkî taybet daye zimanê kêmayetiyên (azînlîk), ku bi latînî jê re dibêjin mînorîtet. Ev jî, bi tenê ji bo samiyên ku li bakurê Swêdê dijîn, finiyên ku li Swêdê û romenên (çîngene) ku li dinyayê belav bûne û bê dewlet in, derbas dibe. Li Swêdê ev hersê grûb, xwediyê statûyêke taybetî ne û dewlet ji wan re imkanên berfireh pêşkêş dike. Yanî statû-

ya zimanên zikmakî û ya kêmayetiyên ne yek e. Ji derî van hersê grûbên zimanan, mafên yê din wekhev in.

Niha li Swêdê çend mamoste û çend şagirtên kurd hene?

Li seranserê Swêdê bi qasî 100 mamosteyên kurd, di zarokxane (kres), dibistana seretayî (îlkokul), dibistanên gel (halkokulu) û lîseyan de kar dikin. Her wiha di navbera 3,4 hezarî de jî şagirtên kurd hene, ku ew diçin dibistanên kurdî. Ewqas jî zarokên kurdan hene ku naçin dibistanên kurdî. Hinek ji wan dê û bavên wan naxwazin û hinek ji wan jî di şûna kurdî de diçin tirkî, erebî an jî farisî.

Çima ew kurdî naxwazin?

Çend sedem hene. Yek; li Swêdê zimanê zikmakî ne mecbûrî ye, bi daxwaza dê û bavên ve girêdayî ye. Heger dê û bav bixwazin dibistan mecbûr in, ku ji zarokên wan re mamoste bibînin, ku nexwazin zarok naçin dersên zimanê zikmakî. Dê û bav her sal bi destpêka dibistanê re, divê ji bo zimanê zikmakî serî li birêveberiya dibistanê bidin. Heger wê yekê nekin, zarokên wan nikarin beşdarî perwerdehiya zimanê zikmakî bibin. Ya duyem; gelek kurd hîn jî girîngiya zimanê zikmakî nizanin û ji ber wê yekê zarokên xwe ji bo zimanê zikmakî qeyd nakin. Ya sêyem; hinek kur-



Berdevkên dewletê, dîsa dest bi dûvikê propagandaya "bi zimanê kurdî perwerdehiya naçe serî" girtiye. Lê ev ji 20 salan zêdetir e, li Swêdê, ku gelek kurdan navê wê nebihistiye, kurd li dibistanan hîn zimanê xwe dibin.

Tîgrîs:

mamostetiyê bikin!

ên ku têkiliya wan bi Tirkiyê re heye, ji konslosxaneyên tirk ditirsin, ku giliya wan were kirin. Ji bo wê yekê zarokên xwe nasînin derxistin zimanê kurdî. Ev malbat, di şûnê zarokê de zarokên xwe dişînin bersên tirkî.

Ev 15-16 sal in, ku hûn li Swêdê mamostetiya kurdî dikin, gelek şagirtên we dibistan qedandin û îro di nav civata kurd de kar dikin. Hûn sûd û encama perwerdehiya bi zimanê zikmakî dibînin. Fêdeya vê yekê çi ye?

Ev pirs we gelekî girîng e û di cih de ye. Em di dersên zimanê zikmakî de, bi tenê behsa ziman,

Li Swêdê mafê zimanê zikmakî qanûnî ye û ji bo hemû grûbên biyanî derbas dibe. Ji bo kurdan jî wiha ye. Li Swêdê, ev maf jî bo kurd û tirkên eynî ye. Li seranserê Swêdê bi qasî 100 mamosteyên kurd û di navbera 3-4 hezarî de jî şagirtên kurd hene, ku ew diçin dibistanên kurdî.

xwendin û nivîsandinê nakin û li ser wan mijaran ranawestin. Em li gorî bernameyê neteweyî û demokratîk perwerdehiya kurdî dimeşînin. Kurdistanê bi şagirtên xwe didin nasandin û hezkirin. Dîroka kurd û Kurdistanê hîn wan dikin. Li ser edet û nasnameya kurdî radiwestin. Bi kurtahî, em niştîmanperwerî û kurdayetiyê bi wan didin nasîn. Ji ber vê yekê, ew şagirtên ku bi salan diçin perwerdeya kurdî, di pratîka jiyana xwe de, ji yên ku din diyar in û di navbera wan de ferqeke mezin heye. Gelek şagirtên min niha di dem û dezgehên kurdan de dixebitin. Wek mînak; niha ji wan çend di televîzyon kurdî de kar dikin. Ez bi wan gelekî serbilind im. Dema ez wan şagirtên xwe dibînim, bawer bikin ji kêfan lingên min erdê nagirin.

Gelo mirov dikare bêje, dema di rojên pêş de, li welêt îmkana çêbin, de ev şagirtên îroyîn bikaribin, di warê ziman û wêjeya kurdî de erk û rola xwe hilgirin?

Bêguman. Lê ne hemû, beşek jê de rola xwe pêk bînin. Ji ber ku ji niha ve berhem û encam diyar e. Ev nîşê me yê nû, yê ku li Ewropayê mezin bûne û li vir perwerdeyehiyê baş dîtine. Lewre di her warî de ew dikarin rola xwe

pêk bînin. Lê metirsînek jî (tehlîkek) heye. Heger ev nîş, li Ewropayê wînda nebe, ji welat û niştîmanperweriyê bi dûr nekeve!

Mamoste, tengasî an jî arîşeyên mamosteyên kurdî di çi warî de hene? Wekî di warê zimên, pirtûkên dersê, materyal û hwd?

Dema me li Swêdê dest bi perwerdehiya bi zimanê zikmakî kir, tu pirtûk û materyalên perwerdehiyê jî bo kurdî tunebûn. Me gelek zehmetî kişand. Piştê ez jî di nav de, me bi salan komîte û komîsyonên pirtûk û materyalên kurdî saz kirin. Îro li gorî 10-15 sal berê rewş gelekî baş e, lê têr nake.

Niha di polên (sinif) me yê kurdî de, gelek pirtûk û materyal hene û piraniya wan jî aliyê mamosteyên li Swêdê ve hatine çêkirin. Çend jî wan jî li Berlînê hatine amadekirin. Lê, ev pirtûk û materyal ne li gorî polên serbixwe ne, li gorî rewşa zimanê zikmakî û rewşa welatên Ewropayê ne. Mirov di rojên pêş de dikare jî wan sûd bigire û li gorî rewşa welêt çêbike. Li ber destê me niha alfabe, pirtûkên xwendinê, dîrok û cografya Kurdistanê û li ser kurd û Kurdistanê çend pirtûk û materyalên kurdî hene. Her ku diçe zêde û baş dibin.

Hûn di perwerdehiya kurdî de kîjan alfabe û rêzimana kurdî bi kar tînin?

Em alfabe û rêzimana Celadet Bedirxan bi kar tînin û li ser bingeha wê perwerdehiyê dimeşînin. Lê, li gorî prensîbên pedagojîk, şertên Swêdê û asta (sewiya) zarokan guhartinên biçûk tê de çêdikin. Pirtûkên ku ji bo dersê hatine amadekirin û yê ku bînin amadekirin, li ser bingeha alfabe û rêzimana Celadet û birayê wî Kamran Bedirxan in.

Hûn mamosteyên kurd, bi çend alfabe û zaravayên kurdî

ders didin?

Bi du zaravayên kurdî: kurmançî û soranî. Niha bi dimilî (zazakî) mamoste û materyal tunene. Zarok jî kêman in.

Hûn di hefteyê de çend saet dersên kurdî didin?

Dibistanên ku zarokên kurdî li wir gelek in, li gorî asta polan grûbên çêkirin û her grûbê saetek mafê wê yê dersê heye. Lê, li dibistaneke ku zarokêk bi tenê jî hebe, pêwîst e ku, mamoste saetekê dersa wî/wê bide. Ji derî wê, ew zarokên ku nû hatine Swêdê, baş bi swêdî nizanibin an jî di dersên xwe yê swêdî de ne serketî bin, mafên wan heye, ku di hefteyê de, ji bo her zarokêk/e saet an du saetan mamosteyê/a zimanê zikmakî alîkariya wî/wê bike.


Heta du sal berî niha, di destpêka dibistanê de, mamosteyê/a zimanê zikmakî û yê swêdî li hev dikirin, ku di kîjan saetî de zarok dê here dersa zimanê zikmakî. Lê, niha ev qanûn hate guhartin. Ji bo zimanê zikmakî, divê dersên swêdî biqedin û piştê, zimanê zikmakî dest pê bike. Yanî piştî nîvro zarokên perwerdehiya zimanê zikmakî. Ev jî politikaya Swêdê ye, ku zimanê zikmakî kêman bike û pê re pê re jî navê rabike. Ji ber ku piştî nîvro, zarok bi xwe naxwazin werin perwerdehiya zimanê zikmakî. Hevalên wan ên swêdî diçin malê. Piraniya zarokan piştî dibistanê diçin sporê dikin. Ji aliyê din ve zarok diwestin, birçî dibin. Lê, ew dersên alîkar ku me got, ji bo ew zarokên ne serketî, wekî berê di nav dersên swêdî de jî tene dayin.

Mamoste, ez ji bo van agahdariyên we, li ser navê Azadiya Welat spasîya we dikim. Heger gotinekê we ya dawî hebe, fermo!

Bêguman li derveyî welêt sûda perwerdehiya zimanê zikmakî gelek e, lê ya herî girîng perwerdehiya li ser axa welêt e. Ez bawer û hêvîdar im, ku di demeke gelek kurd de, em dê li Amedê dest bi perwerdehiya kurdî bikin. Ez jî vê yekê re amade me. Wekî tê zanîn, ez jî xebatkarekî kevn ê Azadiya Welat im. Kêman be jî, piçek nan û xwêya min jî di xebata wê de heye. Ev demeke dirêj e, ku îmkânên min dest nedan ku ez alîkariya rojnemaya xwe bikim. Ez dê hewl bidim, ku ji vir bi şûn ve alîkariya wê bikim.

Jinênigart:

"Ne dê û bavê min û ne jî tu kesî din dizane, ez kîjan salê çêbûme. Lê li gorî qeyda nîfûsê, ez di sala 1946'an de li Licê hatime dinyayê. Ez hîn 78 salî bûm, bavê min mir. Min di neh saliya xwe de, li Licê li Gazi İlkokulê dest bi dibistanê kir. Ji derî dusê zevî û rezek, tu mal û mulkê me tune bû. Ez di nav xizanî û bêkesitîyê de mezin bûm. Min hem dixwend û hem jî kar dikir. Hema hema karê ku min nekiriye tune. Piştî xwendina dest-



Amed Tigrîs, di nav refên Teverga Çepgir ya Tirkiyeyê de dest bi têkoşînê kiriye. Tevî vê yekê ew niha bengiyê zimanê kurdî ye. Ew jî mêj ve ye li Swêdê dijî û mamosteyê dersên zimanê kurdî ye.

pêkê, min li Erxeniyê dest bi dibistana mamostetiyê kir. Di sala 1969'an de ez bûm mamoste û min li gundê Licê li Cinezûr û piştê li Şêxanê mamostetî kir. Di nav komela mamosteyan TÖBDER'ê şûbeya Licê de wekî serok, sekreter û nûnerê şûbê çend sal min kar kir. Ji ber sedemên siyasî gelek caran hatim girtin û pirsîyarkirin. Di sala 1977'an de ji ber sedemên civakî û siyasî bêgav mam, ku dest ji mamostetiyê berdim. Min di wê demê de bi Partiya Komunîsta Tirkiyê (TKP) re kar dikir. Ez di eynî salê de, bi malbatî derketim derveyî welêt. Me di demeke gelek kurd de, bi politîk û îdeolojîk li hev nekir û ez jî TKP'ê qetiyam. Bi qasî salekê, li welatên sosyalîst ji destê birêveberên Partiyê min gelek êş û elem dît. Di dawiya sala 1978'an de vegeryam Amedê. Bi qasî salekê, di bin merc û şertên gelek dijwar de li welat û metropolên Tirkiyeyê mam. Vê carê min dest pê kir bi DDKD re xebitîm. Carekê din bêgav mam û berî hatina Cûnteya 1980'î ez derketim derveyî welêt. Bi awayekî perîşanî li gelek welatên Ewropayê geriyam û heta ku ez gehîştim Swêdê; êdî cûntaya 1980'î hatibû ser hukim. Ez li Swêdê bûm penaberê siyasî. Bi hatina Cûntayê re wekî gelek rêxistinên kurd DDKD jî felişî û li ber xwe neda. Çend grûbên biçûk çêbûn. Demekê min jî di nav grûbêkê de cih girt û piştê min bawerî pê anî, ku em xwe dixapînin an jî dil didin ber xwe û min dev ji wan berda. Min dest bi mamostetiya kurdî kir û carina jî bi kurdî hinek tişt nivîsandin. Wekî xebatkarekî, min heta îro di gelek kovar û rojnemayên kurdan de her cure kar kir. Sê sal berî niha, min çend bernameyên zarokan amade kirin û Med TV ew weşandin."

Berhemek Ji Ronesansa Kurd:

Orkestraya Neteweyî ya Kurd

Di destpêkê de bi destpêsiya hunermendê nemir Qadir Dîlan û Akademiya Çand û Hunera Kurdî gelek hunermendên kurd li hev civiyan û piştî vê hate ku zanîn hunermendên kurd dikarin bibin xwedî orkestrayê neteweyî.

Diristkirina orkestrayê senfonî, her dem ji bo hunermendên akademîsyen ên kurd, li her çar parçeyên Kurdistanê daxwazê dêrîn bûye. Yek ji hewlên baş di vê rêbazê de, ji destpêka salên 90'î jî aliyê Ebdu Cemal û çend hunermendên din yê ciwan, li başûrê Kurdistanê dest pê kir û wan karî yek-du konsertan pêşkêş bikin. Lê mixabin ji ber piştgirînekirina sazîyên hunerî û aborî nekarî xebata xwe bidomînin û karê orkestreyê bi pêş bixin. Di heman çaxê de em dikarin bibêjin, ev têkçûna nebû sebaba dilsariya hunermendên akademîsyen ên kurd, ji bo sazkirina orkestrayê kurdî. Ji bona wê jî ev car li derveyî welêt û ji bo heman armanca, bi hevkarî û piştgirîya Akademiya Çand û Hunera Kurdî ya li Almanyayê pêngavek pêşkêftir ji bona damezrandina wê hate avêtin.

Di destpêkê de bi destpêsiya hunermendê nemir Qadir Dîlan û Akademiya Çand û Hunera Kurdî gelek hunermendên kurd li hev civiyan û piştî çendîn rûniştin û gotûbêjên dûvedirêj, ketin nava pêkanîna hewl û xebatên xwe. Di yekem pêngavê de bi bangkirina amûrjen û kompozîtorên akademîsyen ên kurd li derveyî welêt karî programeke gelek kurt, mîna ezmûnekê ji bo orkestraya kurdî pêk bînin. Ev pêngav bû sedema jiyandin û mezinbûna mebesta pêkanîna û damezrandina orkestraya kurdî.

Piştî wê hindê hate zanîn ku hunermendên kurd dikarin bibin xwedî orkestrayê. Di wextê amadekirina duyemîn konsertê de, navê wê Orkestreya Neteweyî ya Kurd hate danîn. Her çend rewşa siyasî ya Kurdistanê di roja îro de pir dijwar û giran e jî, Orkestraya Neteweyî ya Kurd li derveyî welêt her tim di halê pêsketinê de ye. Heya niha Orkestreya Neteweyî ya Kurd zêdetir ji 15 karên kompozîtorî yê kurdî û biyanî, ji muzîka Barok hetaya nûjen, pêşkeşî gel kirine.

Armanca Orkestreya Neteweyî ya Kurdî, beriya her tiştî dewlemendkirin û nasandina muzîka zanistî ya kurd bi gelên Ewropa û her wiha berevajî vê jî nasandina muzîka ewrûpî bi gelê kurd. Her wiha xebitandina hunermendên Akademiya Kurd û girîngî pêdana hunera li ser wan e.


Mirov dikare çend damezrîner, xebatkarên orkestrayê wiha bide nasîn.

Qadir Dîlan

Bo yekem car Qadir Dîlan harmoniya Tonalê ji muzîka klasîk ya Ewropayê veguhastîye nava muzîka kurdî û bi heman şeweyê muzîka kurdî jî anîye nava muzî-

ka ewrûpî. Qadir Dîlan, di sala 1966'an de bo xwendina muzîkê gihîşt Pragê. Piştî çend salan, çendîn marşên kurdî û awazên folklorî di muzîka kurdî û di muzîka Ewropayê de bikaranîn. Qadir Dîlan, di sala 1929'an de li Silêmaniyê jî dayik bûye û di temenê ciwanîyê de dest bi xwendina muzîkê kiriye. Em dikarin wî wekî hunermendê kurd ê yekem bihesibînin, ku gelek amûrên (enstürmental) muzîka Ewropayê yê mîna klarnet, trampet û hwd anîne nava muzîka kurdî. Dîlan yek ji damezrînerê Orkestraya Neteweyî ya Kurd tê jimartin. Hinek xebatên wî mîna Demî Raperî, Fentazî, Bîrewerî (bîranîn), hwd bo orkestrayê hatine nivîsîn. Ev xebatên wî, çend caran ji aliyê Radyoya Pragê û Orkestraya Pragê, her wiha çend car jî ji aliyê Orkestraya Neteweyî ya Kurd ve hatin pêşkêşkirin.

Qadir Dîlan di 18'ê adara 1999'an de li Pragê çû ser dilovaniya Xwedî û li vir hate veşartin.



Abdullah Cemal

Abdullah Cemal, di sala 1965'an de li Silêmaniyê hatiye dinyayê. Yek ji ciwanên bi bizav û pirxebat bûye, ku li Bexdayê xwendina akademiya hunerî bîriye serî. Niha jî li wir mamoste û serperistê Senfoniya Orkestraya Bexdayê ye. Abdullah Cemal heya niha çend xebatên xwe bo orkestrayê amade kirine. Ji kompozîsyonên wî yê hilbijartî, mîna konsert bo sentor û orkestra hene. Senfoniyeke wî jî aliyê Orkestreya Neteweyî ya Kurd ve dê bê pêşkêşkirin.

Kompozîtor û Dirîgênt Nejat Emîn

Nejat Emîn di sala 1966'an de li Ker-

kukê hatiye dinyayê û ji 12 saliya xwe dest bi xebata muzîkê kiriye. Di bin çavdêriya mamosteyên mîna Enwer Qerecdaxî, Ferîdon Dartas û Xalid Serkar de fêrî muzîkê bûye. Cara yekem di Koma Muzîkê ya Zarokan ya Pîremêrd de xebitiye (1980-82). Di sala 1982'yan de çûye Ewropayê û ji 84'an vir de xebatên xwe ye muzîkê li Danîmarkayê didomîne. Di navbera 1986-1988'an de xwendina peymangê li Kopenhagê bi dawî anîye, ku piyano, keman, harmonî û hînkirina guh ji wan in. Di sala 1991'ê de li Polonyayê xwendina kompozîsyonê ku pênc sal in, di bin çavdêriya Prof. Françîsek Wozniak de, di çar salan de bi pileyek bilind qedandîye. Hem di dema xwendinê de hem jî piştî ku qedandîye li Polonya, Kanada û



ya salê 1980'yî de mirov dikare navê Hoşeng Kamkar bide. Her wiha yekemîn car li bakurê Kurdistanê jî kompozîstê kurd bi navê İsmail Bulut gihîştîye ku heya niha sê senfonî û çend muzîkên kameralfî nivîsandine. Senfoniya İsmail Bulut ya duyem ku zêdetir şeweyê Richard Strauss girtiye nava xwe, ji bo yekemîn car jî aliyê Orkestraya Neteweyî ya Kurd ve hate pêşkêşkirin.

Ako Azîz

Wekî hate gotin ku dawîya 1980'yî û destpêka 1990'î bû salên dewlemendbûn bo pêgihîştina çendîn muzîsyenên kurd e. Pîraniya wan bêyî xwendina taybet a li ser kompozîsyonê û tenê bi xebata li ser amûrekî ku piranî keman bû an jî xwendina taybet a li ser harmoniyê bû, bi rengekî zanistî muzîk bi dawî anîye, dest avêtîye kompozîsyonê. Ji nava van hunermendan kompozîtorên şareza yê wêkî Ako Azîz, Berzan Yasîn, Şêrwan, Karîn, Abdullah Cemal derketine. Hinek ji wan mîna Abdullah Cemal karê wan ê sereke bûye kompozîsyon.

Ako Azîz di 1967'an de li Silêmaniyê jî dayik bûye. Azîz ji 9 saliyê xwe ve mijûlî xwe perwerdekirinê li ser kemanê ye. Niha konsert masterê Orkestraya Neteweyî ya Kurd e. Xanbacî jî bo keman û piyanoyê nivîsandîye, Necat Emîn bo orkestrayê dabêş kiriye û ev yek wê di programeke orkestrayê de bê pêşkêşkirin.

Aro Stephanian

Aro Stephanian yek ji kesên ku rêbaza kompozîtorê navdar Komêtas bi baştirîn şeweyî dişopîne ye. Komêtas jî ber ku li ser muzîka kurdî jî di heman demê de wêkî yekmîn kompozîtorê kurd tê hesibandin.

Aragaz yek ji staranên kurdî ku Stephanian ji bo sofran digel piyanoyê çêkiriye ku ji aliyê kompozîtorê kurd Necat Emîn ve hatiye wergerandin bo ser mûrê trampet û ji bo orkestraya hatiye dabêş kirin û wê konsertekê bê pêşkêşkirin.

KAQŞAR. C. OREMAR

Dengvedana hilbijartinên Tirkiyeyê 'Gurgeboz ji nû ve dizûrin'

BEŞA NŪÇEYÊN DERVE

Hilbijartinên li Tirkiyeyê di çapemeniya cihanê de bû sedema nixandîna cur bi cur. Tiştê ku zêde li ser hatiye rawestandîna karkirina DSP û MHP'yê. Nixandîna hevpar xeternakîya gurbûna neteweperestiyê ye. Bo nimûne rojnameya Franfurter Rundschau di hejmarê xwe ya roja 21'ê avrêlê de cih da nivîseke bi sernavê "Gurgeboz ji nû ve dizûrin..." Tirkiyeyê hêz da neofaşîstan". Rojnameya Suddeutsche Zeitung cih daye nûçeyêke bi sernavê "Tirkîtiya nû", di vê nûçeyê de gotin, Tirkiye ji Ewrûpayê dûr dikeve û xewnên împaratoriyeke mezin a bi navê "Turan" dibîne. Ji Ewrûpayê dûrketina Tirkiyeyê, wekî dîtineke hevpar a çapemeniya Ewrûpayê balê dikişîne. Nixandîna bi heman şeweyî di gelek weşanên din de jî cih girtiye. Bo nimûne, Rojnameya Liberation gotiye: "Tirkiye ji Ewrûpayê rûyê xwe ba dide." Rojnameya belçikî Le Soirê dibêje, "Tirkiye neteweperestîya xwe nişan dide", "Dîsa rojnameya belçikî Le Matin gotiye "Zêdebûna neteweperestîya xetermak" Di rojnameya Swîsreyê Der Bund de sernavêkî balkêştir hatiye bikaranîn: "Gurgebozên ku postê berxan li xwe pêçan e". Rojnameya yewnanî To Vima jî ev nixandîna kiriye: "Neteweperestî Tirkiyeyê jehrî dîke".

Rojnameya Swîsreyê Tages Anzeigerê di nûçeyêke xwe de jî da zanîn ku "Demokratîkîbûna ku maye bihareke din". Di bin sernav re spotê bi rengê "Li Başûrê Rohilat rêveberî kete destê kurdan, ew jî ditirsîn ku bi gurgebozan re rû bi rû bimînin. Di nûçeyê de hatiye daxuyandîna ku MHP hêza xwe ji şerê li Kurdistanê digire û hebûna kurdan nas nake. Di dema hilbijartinê de jî ciwanên en-



Dîmenek ji kampanyaya HADEP'ê ya di hilbijartinê de

damê MHP'ê êrişê konvoyên HA-DEP'ê û partiyên çepgir kiriye.

Digel serkeftina DSP, MHP û xeteriyên ku ev yek bi xwe re tine, serkeftina HADEP'ê û pest û pêkutiyên li ser vê partiyê jî bûne mijara nûçeyên HADEP'ê. Bo nimûne Rojnameya Liberationê roja 21'ê avrêlê cih daye nûçeyêke bi sernavê "Li Tirkiyeyê serkeftina hilbijartinê ya partiya kurdgir e".

Di vê nûçeyê de hatiye daxuyandîna ku HADEP'ê li Kurdistanê rêveberîya belediyeyê gelek bajarên bi dest xistiye. Di nûçeyê hatiye gotin

ku rêveberîya 40 bajarî ketiye destê kurdan. Her wiha nûçe balê dikişîne ser diwariyên li pêşberî wan rêveberên nû jî. Di gelek nûçe û şîroyeyên din jî li ser HADEP'ê hatiye rawestandîna. Bo nimûne sernavê nûçeyêke Reutersê wiha ye: "Besê êdî çewsandîna, ez dengê xwe didim HA-DEP'ê", di nûçeyêke din a Reutersê de tê gotin ku HADEP li herêma kurdan bi ser ketiye. Radyo Free Europe jî di nûçeyêke xwe bal kişandîye ser serkeftina HADEP'ê ya di hilbijartinê. Di nûçeyê de li zilma li ser HA-DEP'ê jî hatiye rawestandîna.

DI ÇAPMEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

REUTERS

✓ Li gorî nûçeyêke Reutersê ku roja 19'ê avrêlê hate belavkirin, Rûsyayê bîdengîya Ewrûpayê ya li hemberî êrişê Artêşa Tirk a li ser başûrê Kurdistanê şermezar kir. Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê bi daxuyaniyekê êrişê Tirkiyeyê şermezar kir. Di daxuyaniyê de kêşeya Kurd û ya Kosovayê wekî hev hatiye dîtin û ev tişt hatine gotin: "Ji Rojava nebûna tu reaksiyona li hemberî van kuştînan durûtiya rojavahiyan nişan dide. Di mînakê de diwariyên çareserkirina kêşeyên hundirîn dibin sedema êrişê NATO'yê, di mînakê din de bîdengmayîna rojavahiyan tê dîtin." Li aliyê din Iraqê li ba Yekîtiya Ereban giliyê Tirkiyeyê kir û xwest ku hêzên Artêşa Tirk ji başûrê Kurdistanê derkevin.

AP

✓ Ajansa AP'ê roja 20 avrêlê nûçeyêke şîroyeyî belav kiriye. Di nûçeyê de hatiye gotin ku kurd bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî "NY" mayînan paqij dikin. Nûçe bi serpêhatiya xortekî 14 salî yê bi navê Îsmail Alî dest pê dike. Alî li gundekî çiyayî di 5'ê rezbera 1998'an de ji ber teqîna mayîne lingekî xwe dide der. Di hevdîtina ku li nexweşxaneyê bi wî re hatiye kirin de dibêje ne gengaz e ku mirov bi lingekî bilîze. Di nûçeyê de hatiye gotin ku li başûrê Kurdistanê ku nifûsa wê 3.3 milyon e, 10 milyon mayînan hatine bicihkirin. Li gorî agahiyan li Başûr ji 1991'ê vir de 2900 kesî ji ber mayînan jiyana xwe ji dest daye û % 20'ê zeviyan ji ber mayîne nayê bikaranîn. Hatiye gotin ku xebatên derxistina mayînan di meha avrêlê de dest pê kiriye û heta niha 600 wekî pisporê vî karî hatine perwerdekirin û 14 kûçik jî ji bo vî karî ji Afrîkaya Başûr dane anîn.

WASHINGTON POST

✓ Di rojnameya Washington Postê de li ser Kongreya Neteweyî ya Iraqê (INC) nûçeyêke şîroyeyî hatiye amadekirin. Di nûçeyê de li ser kesayetîya Serokê INC'ê yê berê Ahmed Çelebî hatiye rawestandîna. Tiştê ku ji nûçeyê derdikeve ev e ku CIA'yê ew wekî serokê hêzên dijber ên Iraqê berpîrsiyar kiriye, lê di rastiya xwe de li ser gelê Iraqê tu bandora wî nîn e. Çelebî li Urdinê jî ber dizîya ku kiriye, ceza xwariye û niha jî naxwaze hesabê pereyên ku Amerîkayê dayê, bide INC'ê. Ji ber her kes jî wî bi gilî ye, ew di civîna ku 7-8'ê avrêlê li Londonê pêk hatiye de, ji serokatîyê hatiye xistin û rêveberîyeke hevpar hatiye hilbijartin. Ji vê nûçeyê diyar dibe ku DYA nikare li Iraqê xwe bigire..

Di çapemeniya biyan de Doza Sedsalê

Serkeftina DSP û MHP'ê girîngiya parastina ewlehiya canê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li ber çavan saxist. Lewre piştî hilbijartinê bi rojekê dozgerên DGM'ê dan zanîn ku dozname (îdianame) ya Öcalan hatiye amadekirin û tê de cezayê daleqandinê bo Öcalan tê xwestin. Li ser vê yekê hikûmeta Îtalyayê di cih de reaksiyona xwe nişan da û da zanîn ku bi encama hilbijartinê re ewlehiya jiyana Öcalan nemaye. Wezîrê Karê Derve yê Îtalyayê Lamberto Dîni helwesta Ewrûpayê ya li hemberî Kêşeya Kurd rexne kir û bal kişand ser durûtiya di vî warî de. Di çapemeniya biyan de tê gotin ku partiya faşîst Öcalan bi dar ve bike. Di nûçeyêke Ajansa AP'ê ya roja 21'ê avrêlê de hatiye gotin ku dibetîya darvekirina Öcalan zêde bûye. Di nûçeyê de van gotinên berdevkê MHP'ê Ata Türkoğlu cih girtiye: "Heke dadgeh cezayê mirinê bidê, em dê dengê xwe bidin da ku ew bê darvekirin." Gotinên parêzerê Öcalan A. Zeki Okçuoğlu ên bi rengê "Niha selmandina biryara darvekirinê ji berê hêsantir bûye" jî di nava nûçeyê de cih girtiye. Di nûçeyêke AFP'ê ya roja 21'ê avrêlê de jî li ser heman mijarê hatiye rawestandîna. Di nûçeyê navborî de hatiye gotin ku dirûşmeya sereke ya MHP'ê "bimre Öcalan" e û ev yek jî dibetîya selmandina biryara daleqandinê zêde dike. Diplomekî ewrûpî jî gotiye, "Zêdebûna hêza neteweperestan rîska daleqandinê Öcalan zêde dike."

Evîna Fatima Salih Axa û Mihemedê Mîrê Hoska

Bayê evîna Bêrîvanekê û çelengsiwarekî

Salih Axa li Deşta Rewandûzê xwe-dî êl, eşîr û pezê giran e. Keçeke wî heye navê wê Fatimê ye. Heçî Fatimê, li dinê xweşîkbûn ji kesî re nehiştiye. Nav û dengê xweşîkbûn û rindbûna Fatima Salih Axa li her derê belav bûye...

Li Hoskan ciwanên gund derketibûn rasta bendera û ji xwe re bi gogê dilîstin. Li nav xortan Mihemedê kurê Mîrê Hoska jî hebû. Mihemed, tam hatiye kemala xortaniyê û mîr li ber çavên xwe li dinê nabîne.

Li nav Êla Hoska pîrek jî heye, jixwe emrê xwe biriye serî û hew kurekî wê yê bi tenê heye. Pîrê, ne bi dilekî lê, li bihez-zar dilî bi ser kurê xwe de dilerize. Dinya tevde li alîkiyekî, kurê wê jê re li alîyekî. Kurê pîrê jî, li rasta benderan li nav xortan bi gogê dilîze. Vê carê dema xort bi gogê dilîzin û Mihemedê kurê Mîrê Hoska jî jixwe weke hêç be û çima sînga wî li sînga kurê pîrê dikeve û belengazo lawê pîrê tep û li erdê dikeve. Ji xwe ve dihere û dixeriqe. Rebeno wekî deh roj berê miribe. Pîrê pê dihesê, tê ser kurê xwe. Pepûkê li xwe dixê, digirî. Di-jûn û nifiran dike, dibêje: "Kê lê xiste, kê lê xiste?" Dibêjin, Mihemed lê qelibî. Pîrê berê xwe dide Mihemed û dibêje: "Ma te xêr e lawo. Te pozê xwe bilind kiriyê û tu xwe di xortan de didî. Tew, tu dibê-jî qey çûye Fatima Salih Axa ji xwe re xwestiye."

Gava pîrê van gotinan dibêje, Mihe-med sar dibe, wekî ku tu satilek ava sar bi ser da kî, wa dicemide. Welhasil, qa-sekê paşê, kurê pîrê hat ser xwe û pîrê kurê xwe rakir bire malê.

Şev bû nivê şevê lê, xew nekete çavên Mihemed. Nivê şevê rabû xençera xwe girte û berê xwe da aliyê konê pîrê. Xen-çera xwe kuta ser dilê pîrê û got: "Ez qe-sem bi navê Xwedê dikim, tu cih û mes-kenê Fatima Salih Axa ji min re dibêji, bibêje, ger tu nebêji ezê te bidim ber vê xençera han û hebek ji hestiyê te sax ne-hêlim." Pîrê xwe vir de wê de da û got: "Wey li min, ma ev çi bû? Çi qewimî, mi çi bi xwe kir?" Mihemed got: "Çareya te tune, gere tu bêji." Pîrê got: "Êla salih Axa li Deşta Rewandûzê li alî pera avê kon vedane. Aliyek konên wî deşt e, yek çiya ye. Çiqas feqîr û fuqare hene, tim xwe li wî digirin. Tu here, ger Xwedê bi-ke, tuye bibînî."

Mihemed ji nav konan derket, qasekî meşiya. Paşê di xwe de fikirî ku ger bi van cil û bergên axatiyê here, wê tu car negihê miraz û meqsedan. Vegeriya, bedlek cilên şivanan û feqîran li xwe kir, berê xwe da oxirê û pişta xwe da felekê, rê girt û meşiya.

Mihemed sê roj û sê şevan, li ser rê dirban, banî û newalan meşiya. Parçeyên cilên wî bi guliyên dar û deviyên ve man. Bi zeraqa derketina tava rojê re li zozanê Rewandûzê ji wan pirsî got: "Lawo hûn şivanên kê ne? "Gotin, 'em şivanên Salix Axa ne.' Nebêjin?" Gotin 'Belê wele.' Mihemed ji wan pirsî, 'Hûn şivanan na-girin?' Gotin: "Na wele, em şivanên xe-rîb nagirin." Çima? "Gotin 'Pezên me winda dikin, tîfingên me didizin, keçên me direvinînin. Ji bo vê yekê em jî şiva-nê xerîb nagirin.'

Mihemed pîrsa konên Salix Axa kir û berê xwe da aliyê êlê ve û pêncsed heb kon li dora konên mezin hatine danîn, dê ewledê xwe diavêje. Şingîn û gimgîma misînên çay û qehwê ne. Mij û morana çay û qehwê di ser konan re weke ewr wergirtiye. Berê xwe da konê mezin ku bimeşe, lê, di xwe de fikirî ku "bi van cilên feqîran ez herim vî konê mezin bi Xwedê ne kes silava min digire û ne jî kes merhebiyê dide min." Berê xwe wergerand ba konekî ji rêzê, li qeraxê. Konê ku Mihemed berê xwe dayê ew jî bûk û zava kî ku li gorî adetan hîn nû ji xwe re zewicîne û konê xwe nû vekirine ku ji xwe re malekê ava bikin. Mihemed silav li wan da û êvara wan bi xêr kir. Ewan jî gotin 'bi xêr ser çavan re.' Mihe-med got 'Hûnê mêvanan bihewînin?' Gotin 'Ser seran, ser çavan. Tu mêvanê ezîz, mêvanê mêvanê Xwedê ye.' Mihe-med derbas bû aliyê hundur, şîva wî çê-kin danê. Piştî xwarina şivê, mazûban ji Mihemed re got: "Em herin oda axa, ade-ta me ev e." Rabûn, tev de çûn konê Sa-lih Axa. Bi fermana Xwedê, çawa ku hîn baş rûneniştibin, şivanekî Salih Axa ji şivan pirsî, got: 'Lawo te xêr e?' Şivan got: 'Begê min. Va ye, şeş mehên min in ku ez ji te re şivantiyê dikim. Min gelekî bê-riya malî û zarokên xwe kiriyê. Jixwe qewlê min jî teman bûye.' Salih Axa got: "Ê berxê, qe neba te sê roj berê xeber bida min, minê ji xwe re şivanek din bi-dîta." Wê demê mazûbanê Mihemed ra-bû piyan û got: 'Begê min, tu li şivan di-gerî aha va ye ji te re şivanekî din.' Mihe-med rabû piyan, ger bejnek li sere we-ke şitlek rihanê. Kurmanciyek di dev de ye ku mirov xwezî lê guhdar bike. Salih Axa, çiqas li ber digerîne lê, lawik jî pê re dibezê. Salih Axa got: "Lawê min, tu dikarî herî ber pez?" Mihemed got: "Be-lê ezê çima nikaribim? Ez ne ker im, ne kor im, ne seqet im û ne ez tawî me, ne ez bawî me."

Di cih de bedlek cilên şivantiyê danê. Mihemed, kulavê xwe avêt ser milê xwe, gore û çarox xistin lingên xwe û berê xwe da nav keriyên pez.

Fatima keça Sa-lih Axa jî, her roj serê sibehê zû radi-be, cariyên û bêrî-variantan weke çawî-şan li ser wan dise-kine û wan dixebi-tîne. Bi wan mast dide keyîne, nan û xwarina şivanan di-de çêkirin. Xwarina şivanan û elbên şîr dide destên wan û wan dişîne bêriya sibehê.

Bêrîvan hatin ci-hê bêriya sibehê ku xwedêyo çî bibî-nin; ger xortek ji bo şivantiyê hatiye ber-pez ku bejneke li ser e weke şûrê di kalan de. Tu dibêji qey hema teyrekî baz û ji xwe re li vê çola han hatiye, li erdê dani-ye. Bêrîvanan wexta çav berdanê, hiş û aqil di serê wan de nema, av ji devê wan herikî. Vî alî û wî alî avêtin henek û qer-fîkan, bi hev re listin. Dema doşîna pez, lehiya şîr ajote ser kiras û xeftanê bêrîva-nan. Hema bêjin ku heram be dilopa çira şîr nekete nava elban. Bêrîvanan, ji ber çûyîna aqil a ji sewdayê, doşîna keriyên dinê ji bîra kirin. Sê rojan ewa derbas bûn.

Şivanên keriyên dinê nihêrîn ku ne kes tê ji bo bêriyê û ne jî kes ji wan rewari-nê dişîne. Roja sisiyan rabûn. Pez ajotin alî konan ve. Fatim hate pêşiya şivanan, got: "Lawo we xêr e?" Şivanan got: "Xa-tûnê, ev sê rojên me ne em li çolê birçî ne. Ne kes ji me rewari-nê tîne û ne jî kes tê bêriyê. Gelo, ev çi hewal e?" Fatim ra-bû xwarin da şivanan û got: "Hela hûn herin ber pez, ezê li çareya wê binihê-rim." Fatim, bêrîvanan digire bin pirsê. Lê, bêrîvan xwe vir de û wê de didin û rastiya meselê jê re nabêjin. Tirsan wan ew e ku ger Fatim pê bihesê ku wa lawi-kekî delal hatiye ber pez, belkî ew jî bê bêriyê û jixwe, Fatim jî qîz e, ger çav berde, wê dilê wê jî tîkeve û wê Mihe-med ji destên wan here. Jixwe, bi zor Xwedan li wan hatiye rehmê û wer xortekî delal ji wan re şandiye vê çola hanê. Lê belê, bêrîvan bêçare li xwe tîm miku-rê û dibêjin: "Xatûnê, êde şivanekî nû ha-tiye ber pezê mala bavê te. De bê bavo tu dibêji hema teyrekî baz û ji xwe re dani-ye li ser erdê. Bejnek li ser e weke şîva zivê. Kesê tu car xortek ewa nedîtiye." Fatim piştî ku li wan guhdarî dike, dibê-je: "Qehbikno! Pûştino, weleh min zanî-bû hûn li çolê tolazîyan dikin. Va ye em-rê min bîst û yek e hîn çavên min bi çolê



neketine. Ezê li ser van gotinên we sibê herim bêriyê. Ger gotina we rast be êdî bêrî li min jî qebûl e. Na, ger ne wer be ezê poz û guhên we jêkim û ji bo îbret we berdîm nav êlê."

Fatim piştî ku vê şertê hanê diavêje navê, êdî şev lê dirêj dibe. Êdî Fatim jî hîn çelengsiwarê xwe nedîtiye û dilê wê wekî çûçîka ber biharê lê dikeve. Fatim jî vê şevê pê de radi-be serê xwe dişo, porê xwe şeh dike, gulikên reşqeytanan di hev de dihûne. Xemleke bûkanî li ser bejn û bala xwe dadike. Jixwe, bêhna misk û anberê weke bêhna şitlên rihana teze li der û dor belav dibin. Û xişîn û mişîn jî dikeve ser xeml û xêzan. Bi şeveqa sibe-hê re qanzekê sor dike, dide ser birinca medrebên Çiyayê Qerecdaxê û tevî qey-max, mast û nivîşka sibe-hê. Dest diavêje elban û dide pêşiya bêrîvanan, hêdî hêdî berê xwe didin cihê bêriya sibe-hê.

Fatimê hat cihê bêriya sibe-hê. Şimik û gore avêtin dera hanê. Zend û bendên xwe berjor hildan. Derpiyên şamgêlanî kişandin heta kap û nîrê, rûnişte li ber el-bê. Lingên xwe li dora elbê pêçan û bang li şivan kir ku jê re pez vegefrîne ji bo do-şînê. Mihemed, dest avête mihekê, vege-rande anî ber bêriyê. Ê de Xwedêyo... Dema Mihemed çav berda bêrîvanê... Şewq û şemala eniya gewer sorbûyî, lê-vên gilyazî, diranên hûr ê mircanî, ma wan herdu çavên reşbelek û mijag û ebrû ji xwe weke tîr û kevanên di destê neçîr-vanên kezal û pezkovîyan, mîr ew e ku awir bide. Aqil di serê Mihemed de nema li wê çolê. Êdî ji ber bayê evîn û sewda-yê, beran û nêrî vedigerandin ji bo bê-rîvanê.

(Dê bidome)

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN

Ji bo welatparêzên bawermend, berhemeke nû:

Tîrêjên Bawerî

Geşedana tevgera azadîxwaz a gelê kurd di hemû qad û tebeqeyên civakê de guherîneke berbiçav bû. Civak bi giştî rêxistî bû û vî yekê bandoreke erênî li ser rengî û pirdengiya civakê jî kir. Kesên ji bîr û rayên cur bi cur, bi şeweyekî nû rêxistinên xwe yên xweser pêk anîn û di çawa rêxistinên welatparêz de wan jî cihê xwe girt.

Bi taybetî pirdengiya di warê bawerî û baweriyayî olî de şayanî nirxandinê ye. Ji Yekîtiya Alewiyan bigire heta, Yekîtiya Êzidiyan û ji wê jî heta Hereketa Îslamî ya Kurdistanê gelek tevger û komale hatin avakirin. Digel vî yekê gelek weşanên kurdên welatparêz jî derketin holê.

Di meha reşemiyê de weşanekê nû li yê heyî zêde bû. Ew weşan, kovara "Tîrêjên Bawerî" ye. Her wekî ji navê wê jî diyar e, ev kovar jî hêla kurdên welatparêz ên bawermend ve tê derxistin.

Nivîsên kovarê hem bi kurdî hem jî bi tirkî ne. Rûpelên kovarê bi navên wekî gotar, lêkolîngegerin, ciwan û pêkenok hatine beskirin.

Di pêşgotina kovarê de tê diyarkirin ku ewê bi pênuşa xwe li hemberî bazirganên dinê îslamê û zaliman rawestin.

Di kovarê de bi taybetî nivîsa Hasan (R) balê dikşîne ser xwe. Hasan(R) di nivîsa xwe ya bi sernavê "(Qedexa û înkara Ziman û Çanda Gelê Kurd)" de balê dikşîne ser politîkayên dewleta tirk ên pişaftinê. Hasan(R) diyar dike ku bi van êrişên li ser çand û zimanê kurdan tenê psikolojiya gelan tê xerakirin.


Nivîsên din ên di kovarê de cih digirin ev in: Siyasal Süreç (Rojeva siyasî), İslamda Cihad (Di îslamê de cihad), Gençlik (Ciwana), Şimal Yıldızları (stêrkên bakur), Qedexa û înkara ziman û çanda gelê kurd, Din ve toplumsal tekamül (Ol û tekmûla civakî), Peygamberimizin Hayatı-1- (Jiyana pêxemberê me), Zelalkirina armanc û mebestên îslamê, Qurana pîroz,



Tefsîr, Dersên şerîetê, Çend şîretên Seîdê Kurdî, Mûcahidelerin Kaleminden (Ji pênuşa Mûcahidayan), İslamî Öncüde Ahlak (Di rêberatiya îslamî de Ehlaq), Tarih-araştırma (Dîrok- lîkolîn), Tufan ve Yafes (Tûfan û Yafes)
Kovara Tîrêjên Bawerî ku li Stenbolê çap dibe, bi giştî ji pêncî rûpelî pêk tê.

SERWISA ÇANDÊ

Nûbihar bi hejmara xwe ya nû derket



Kovara mehane ya çandî, hunerî û edebî Nûbihar, bi hejmara xwe ya nû derket. Di vî hejmarê de kesên ku bi nivîsên xwe cih girtine ev in: Sabah Kara (Ji Berpirsiyarê Giştî Nameyeye Vekirî), Osman Tunç (Hec, Qurban û dengvedana li ser Çiyayê Erefatê), Selman Dilovan (Tehfil), R. Karakaya (Mala Minê), Mela Emîn Heyderî (Ereb çi demê hatine Mezopotamyayê), Metînê Licî (Ji Licê çend gotinên pêşiyên), Tehsîn İbrahîm Doskî (Mela Mehmûde Yûsifî), İbrahîm Kurmanc (Mar û Çivîk) û Süleyman Çevik (Riya aqil yek e: Divê pîrsgirêka kurd çareser bibe). Her wiha di kovarê de helbestên Dost Çiyayî (Rûbarek e diherike dilê min), H. Hemo (Raperîn di tariyê de), Sidiq Gorîvan (Tunetî ye), hene. Abbas Alkan, Abdurrahman Cûdî û Sebeheddîn Bidlîsî jî, bi wergerên xwe di kovarê de cih girtiye.

Di destpêka kovarê de nivîsa Sabah Kara balê dikşîne ser xwe. Kara, di nivîsa xwe ya bi sernavê "Ji Berpirsiyarê Giştî Nameyeye Vekirî" de, li ser nivîseke ku di hejmareke berê de hatibû weşandin, radiweste û ji ber ku nivîs li ser remza Nûbiharê derçûbû, çewtiyên di nivîsê de çawa ku wî eleqeder dike, wekî kêmasî û çewtî dinirxîne û xwendevanan hişyar dike.

Nivîseke din ku divê mirov li ser raweste, nivîsara Kelawîj Salih a bi sernavê "Xemla Jina Kurd" e. Nivîs ji aliyê Sebaheddîn Bidlîsî ve hatiye wergerandin. Kelawîj Salih ku yek ji nivîskarên jin a ereb e, di gotara xwe de li ser rewşa jina kurd sekiniye û jiyana wê raxistiye ber çavan. Salih bi taybetî li ser aştxwazî, şervantî û exlaqê jina kurd disekine û Adîle Xanima Helebçeyî û Fatîme Xanima Qatenî ya Rewandûzê wekî mînak dide.

Li ser hilbijartinê

HASAN KAYA



Bi ya min bila tu kes zêde bêhêvî nebe, bila tu kes bêmorale nebe. Lê bila tu kes zêde kêfa xwe jî neyîne û pesnê xwe nede. Lewra mirov dikare hilbijartina 1999'an bi du awayan binirxîne. Heke bi awayekî realist û zanistî bête nixandî, hinek zanînen hêja yên ji bo pêşerojê ku pêşiya me vekin, dê derkevin holê. Bila tu kes nebêje pêwîstî bi nixandîne tune ye; em nikarin wextê xwe bi axaftinê derbas bikin. Ji mirovên ku raya xwe daye HADEP'ê heta bi sekreterê giştî, mafê hemû kesên ku xwedî ked in heye ku di heqê vî hilbijartinê de dîtî, pêşniyar, rexne û çavdêriyên xwe bibêjin. Divê tu kes nebêje îro dewlet bi me re şer dike, lewma jî divê ku em kêmasiyên xwe binax bikin. Helbet wext û cihê axaftinê jî li gorî adetê hîn baştir e. Divê di wextek û cihê maqûl de mirov pipeyive.

Encameke erênî ya hilbijartinê ev e: Tevî hemû pêkutî, astengî, bêderfetî û bênesîbiya me, dîsa li welêt HADEP bû partiya yekemîn. Li gelek cihên welêt jî, mîna Dêrsim, Bedlîs,

Elezîz, zêde ne serkeftî bû. Ev encam tê wê maneyê ku hê jî li gelek deveran kurd di bin bandora politîkayên dewletê de ne. Li van deveran xebateke taybetî, zehmet û bi sebr pêwîst e.

Li cihê mîna Şernexê ku tu xebatên HADEP'ê lê nîn in, dîsa rayên herî zêde hatin standin. Lê li cihê mîna Stenbol û Edenê ku xebata HADEP'ê lê pir e û kurd jî lê pir in, li gorî nisbetê deng nehatine standin. Ji ber vî yekê gelek rojnamegerên tirk dibêjin; "nîjadperestiya kurdî li ser axa wan hate hepskirin."

Di tesbîtkirina namzetan de rastiyeke xwe da der. Ew rastî ev e ku hê jî em gelekî biçûk û di ser re, li doza xwe û li meseleyan dinêrin. Di heqê vî meseleyê de gotinek heye pir tê dubarekirin: "Ku HADEP darekî jî bike namzet ewê dangan bistîne". Rastiyeke vî gotinê heye, lê heta ku rast e, divê mirov baş bizanibe û ji hev kifş bike. Ev gotin ji bo kurdên mîna şîrêzê bi tekoşinê ve hatine zeliqandin tê wateyekê. Heke ku em bibêjin tenê dengên welatparêzên ji can û dil dixwazin, ev gotin rast e, na, ger ku armanca me dorfirehtir be, ev gotineke eletewş e. Di nav xebatan de ev rastî di kesayetiya hinek namzetan de bi awayekî berbiçav derkete hole. Lewra li hinek cihan dema ku namzetê mebûsiyê, an jî yê serokbajariyê di hate nasandin, yên hazir, bawer nedikirin ku bi

rastî jî ev e namzetê HADEP'ê. Bi gotina gel "mêş ji ber wan nedifirîn." De ka çawa ewê bikaribe gel temsîl bike. Naxwe divê mirov baş bifikiriya ku kê li ku deverê namzet nişan bide.

Tevî hemû kêmasiyan û her çiqas li metropolan hindik ray hatibin standin jî, li gelek cihan şerê qirêjî hate teşhîrkirin, gelek kurdên ku ji rastiya xwe dûr in, bi ser xwe ve hatin, ango rastiya xwe nas kirin. Li welêt jî yekîtiya kurdan zexmtir bû û moralê gel xurtir bû. Di vî nivîsara xwe de ez nikarim bi awayekî dorfireh li ser gelek encamên hilbijartinê rawestim. Mirov dikare bi awayekî tîkûz, ji her hêlê ve xebat û encamên hilbijartinê binivîse û ji bo pêşerojê wekî belge bihêle. Lewra xebatên wiha di dîroka me de gavên girîng in. Divê ku bibin mîras ji nifşên nûhatî re.

Belediyeyên ku hatine bidestxistin mewziyên mezin in. Heke ku bi mesûliyeteke giran bêne bikaranîn, ne tenê ji hêla siyasî ve, ji bo berjewendiyên gel ên rojane jî, baş peywira xwe bi cih binin ji bo gelê me û doza me nîmeteke mezin in. Ji asfalt, av, kanalîzasyon, tesîsên sporê, nexweşxaneyên biçûk, atolyeyên xebatê bigire, heta bi pirtûkxane û salonên teatrê û projeyên din, dê çima di nav projeyên belediyeyên HADEP'ê de cih negirin. Divê belediyeyên HADEP'ê bi tiliyan bêne nişandan.

Azad û Mamoste

Azad zarokekî kurd e û diçe dibistana seretayî ya tirkan, lê gelekî dixwaze ku bi zimanê kurdî binivîse û bixwîne. Azad rojekê dîsa diçe dibistanê, bavê wî pereyan didê, ji bo ku gava li dibistanê birçî bibe, ji xwe re tişteki bikire. Azad serê sibê pereyên xwe nade bi xwarinê, diçe bi rojnameyeke Azadiya Welat dide. Rojnameya xwe dike nava pirtûka xwe û diçe dibistanê.

Mamoste dibêje: "Bila her kes pirtûkên xwe derxe, deyne ser maseyê." Azad jî pirtûka xwe ya ku rojname jî di nav de ye datîne ser maseyê. Rojnameyê radike û lê mêze dike. Mamoste wî dibîne, ber bi Azad ve diçe û dibêje: "Ev çi rojname ye di destê te de?"

Azad radibe ser piyan û dibêje: "Mamoste ev rojnameya Azadiya Welat e. Yanî rojnameyeke bi kurdî ye."

Mamoste dibêje:

- Kurdî qedexe ye. Vir ne dibistana kurdî ye. Vir dibistana tirkî ye. Li vir tenê tirkî azad e.



Azad dibêje: Ez dikariim tişteki bibêjim?
Mamoste: Belê. Kerem ke.

Azad: Mamoste aniha tu dengê kûçikekê, yanî hewtina kûçikekê hînî pisikekê bikî, ew pisik jî dengê xwe ji bira bike, qet dengê pisikan nizanibe û tu wê berdî nav pisikan wê ew pisik çi bike?

Mamoste: Nizanîm.

Azad: Dema ew pisik wekî kûçikan bihewte, ew pisikên din wê birevin û wê her yek bi cihêkî ve bibezin û belav bibin. Ma nerast e?

Mamoste: Te ev mesele ji bo çî, ji min re got?

Azad: We kurd tev bela kirine, zimanê me qedexe kiriye. Ez jî dixwazim zimanê xwe hîn bibim.

BERHEVKAR: KAZIM EKİNCİ

Hirç û mirovê tirsonek

Du mirovên gundî bi hev re diçin çiyê. Ji bo ku ji xwe re hem nêçîrê bikin û hem jî hewayê paqij a xwezayê bigirin. Dema ji gund dûr dikevin dibînin ku di nav dar û beran de hirçek ber bi wan ve tê. Her du gundî li hev dinihêrin û li çareya serê xwe digerin.

Yek ji wan ji revê re xurt e û tirsonek e. Yê din nikare bibize û ji hirçê jî natir-

se. Ji hevalê xwe re dibêje: "Divê em ji hirçê netirsîn û ji ber wê nerevin. Gava em jê netirsîn, wê ew jî bi ser me de neyê û wê bi riya xwe de biçe. Lê ger em jê bitirsîn û birevin wê bela xwe di me bide. Dilê xwe qewîn bigire û netirse, hirç nikare tişteki bi me bike."

Her ku hirç ber bi wan ve tê, mirovê tirsonek xwe paş de dide. Mirovê din çî-

qas got; 'ma hevalo tu yê çawa min tenê di nava destê hirçê de bihêlî?' jî fêde nekir û mirovê tirsonek weke bayê reviya û çû xwe di piştê latekî de veşart. Hirç be ser zîlamê din de hat. Zîlam jî ji ber ku nedikarî bireve û tenê nekarî li hemberî hirçê li ber xwe bide, xwe li erdê wek mirîyan dirêj kir. Hirç hate ser zilêm, ser û guhên zilêm, poz û devê zilêm bêhn kir û bi paş de veşariya çû.

Piştî ku hirç ji ser zilêm çû, zîlamê tirsonek jî piştê lêt derket û hat ber hevalê

xwe û jê pirsî:

- Hirçê bi te tişteki nekir û çû, lê min tişteki meraq kir; hirç hat ber te, devê xwe kir guhê te û tişteki ji te re got. Gelo çi got?

- Ez ji te re bibêjim hirçê ji min re çi got?

- Ê wele tu bibêjî wê baş bibe.

- Hirç hat ber min, devê xwe kir guhê min û ji min re got: "Yê ku te li erdê bihêle û here edî pêre hevaltîyê neke!"

Q. DÊRSILAVÎ

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (169)

XAÇEPIRSA

Ç	G	S	H	A	C
Z	E	M	Î	N	Â
T	E	N	A	N	E
Ş	Î	L	E	E	T
N	K	A	X	A	W
E	G	E	R	T	Â
U	S	A	R	D	Ê
Î	N	D	O	Ş	A
E	C	E	M	R	A
Û	Ş	Î	A	N	R



Bersiva Xaçepirsa 167'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi riya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 169'an Pirtûka Weşanxaneyê Pêrî 'Irakta Kürt Sorunu' ye



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Kesên xelata hejmarê 167'an pirtûka 'Dağlarımda Öldür Beni' qezenç kirine ev in: Hüseyin Ayyıldız/ Semsür, Ali İmren/Enqere.

Tawan	Mehele	Tipa berî i'yê	Herêm	Kêfxweş Navçeyêke Bilisê	Yekitiya Niviskarên Navneteweyî
Baydemir (Wêne)	Bi kirdkî me got	Qraleki romayê	4	5	
			Partiyeke legal		
Taban			Sembola renyûmê		
Organeke rûyê mirov				Baneşanek	Dijwateyê bir
				Garantî	
		Meha rojiyê			
		Qehreman			
Birayê dê					
Tipa berî Lyê			Dewleteke cîran Kar		Tipa dû q'yê
3	Bi raketê listin Biçe			Amûreke cotkirinê	
				Êriş	
Esmer	Tipa piştî n'yê		Kêf (berepaşkî)		
			Cetwelek		
				Sembola ger-manyûmê Hewa	
Qapax	Feqîr (Berepaşkî)				
1			Arvan		



PEYVA VEŞARÎ



JI SANDOQAN FAŞÎZM DERKET

Welat

MEM KAYA



MRALÎ RA XEBER ESTA

Destfistina belediyeyan Öcalan kerd kêfweş

MEMED DREWŞ

(e.mail:mehmet@welat.com)

Mehkemaya ke, derheqê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî de biyaya, aya 30'ê menga avrêla 1999 DGM'ya Enqere de viraziyo û rojê mehkemaya esasiyo wija eşkera bibo. Goreyê vatena abûkatanê Öcalanî, na mehkemaya didiyina DGM'ya Enqere de, bê Öcalanî viraziyo. Tabî abûkatê Öcalanî yê, mehkema de cayê xo şirê.

Na mehkemaya esasi niya. Coka wexto taybeto nêpawiyeno. Ze ke verî viraziya, dewleta qandê (serba) mehkemakerdina Öcalanî, Îmralî de ewwan kena hedire. Goreyê vatena serdarê dewlet, eywana ke iyê wazenê Îmralî de virazê, hewna nêqediyaya. Coka mehkemaya DGM'ya Enqerey de bê Öcalanî viraziyo. Serdarê dewletê her çiqas wina vanê jî, kesê hiqûqzanê dergehêrdin û hereymendinê eywana mehkema wina anê zıwan. "Dewleta virazîştinê eywan qastî kena derg. Çike dewleta winakerdina wazena verî wazendeyê Öcalanî bişikino, bado vejo mehkema ver". Na mehkemaya ke 30'ê menga avrêl de DGM'ya Enqerey de viraziyo, mehkemaya esasi niya, mehkemaya verîn a.

Dozgeranê Tirk, wexto ke hewna

Öcalan nêremniyabi Tirkîye, akêrda û iyê derheqê Öcalanî de cezayê îdamî wazenê. Dozgerê îda kenê ke, Öcalan wexto ke raya telefoniya tewrê jew panelê MED-TV biyo, vatenanê xoyê ê programê MED TV de, wasto ke dewleta Tirkîye letey bikiro û leteyê hara Tirkîye de dewleta kurdan rono.

Sandoqan ra vergî vejîyay

Kiştê bînra goreyê xebere ke 21'ê meng de rojnamanê tirk de vejîyay dozgeranê tirk îdanameyê mehkemaya esasi kerdo hedire. Dozgerê nê îdanamey de jî, derheqê Öcalanî de cezayê îdamî wazenê. Iyê zey sebebê îdam wazenê jî, îdayanê corinan û nînan piya jî kerdenê ke PKK hetanî nika virazîştê nişan danê. Ancî zey kiştê eskêr, polis, ceş û kesê bînî ke şer de merdê, înan pêrin jî Öcalanî nişan danê.

Bi rastî cayo ke, kes sero vindiro jî tiya yo. Dewleta verî ra yo, timûtim nînan ana zıwan û tesîrê şovenîzmî kena vêşî (zaf). Tabî ma bi xo hewna îdaname nêdiyo û nêwendo. Feqet, kerdenê dewletê hetanî nika yê, xebere anê rojnamanê tirk kenê rastî. Yanê îdanamey ra, boya şovenîzmî û înkarkerdina şarê kurd a yena. Dewlet hetanî nika, na politîkaya xoya vergê veşanî resnay. Goreyê ma sebebê

sandoqanê weçînayinê peyinî ra vejîyayina vergan jî na politîkaya dewlet a.

Ancî çiyê ke, kes sero vindiro jî, wextê hedirebijayin, yan jî eşkerakerdinê îdanameyê. Weçînayin qediya, sandoqan ra vergî vejîyay, rojê didin dozgerî vejîyayê werte û qediyayinê îdanamey eşkera kerd. Lazimo ke ma wextê hedire biyayinê îdanamey sero jî bifikiriyim û gamanê xo badê rind û weş fikiryayin çekim (berzim). Goreyê vatenanê abûkatanê Öcalanî, mehkemaya esasiya ke Îmralî de viraziyo aya bibo platforma teşhîrkerdena na politîkaya dewlet.

Kurdan vengê xo kerd berz

Ancî qediyayinê weçînayinê peyra, dewleta abûkatanê Öcalanî ra vato ke, niwa tepiya xorê qandê Îmralî şiyayin, Vapûr bivînê. Tabî eke lazim bo, şarê kurd abûkatanê Öcalanî rê Vapûr jî genê. Nay ra gumanê kesî çiniyo. Feqet, tiya politîkaya dewleta barî esta. Aya nînan pêrin, qandê Öcalanî tenya ternayin kena û wazena tecritkerdinê Öcalanî, vêşî bikiro. Hetanî nika, serba Öcalanî dinyay ra tecritkerdin heme çî kerd û aya kena.

Tabî vera nînan, şarê kurdo jî vengê xo keno berz. Weçînayin de şarê kurd, rayê xo day partî da xo û vêşiyê

belediyeyê Kurdistanî, vistî xo dest û serokê xoyê neteweyî Girawê Îmralî de kerd kêfweş. Abûkatî badê weçînayinî, senî ke şiyê Öcalan het, ey verdê heme çî, serokîne belediyeya Amed pers kerdo. Senî ke mûsayo belediyeya Amedî, kurdan giroto kêfweşina ci, hendna biyo vêşî. Tabî wexto ke abûkatî şîbî Öcalanî het 19'ê mengbi, coka hewna Çolemerg, Çewlîg, Agirî, Sêrt, Êlih û Wan û qezey û beldeyê bînê ke, HADEP qeznc kerdîbî eşkera nêbîbî. Wexto ke, min no niwis nûşt abûkatî fina şîbî Öcalanî het û eya pêdiyin virazîştê. Ezo bawer kena, pêdiyino rindo ke abûkatan hetanî nika Öcalanî virazîştê noyo û mijdana rinda ke, hetanî nika daya Öcalanî jî mijdana weçînayinê peyiniya. Çike hend vardayinî virazyay, hend endamê (azayê) ci girotyay binçim û kişyay, nêvirada ke namzetê partî; qandê weçînayin propaganda bikirê. Feqet ancîna jî, a partî weçînayin ra serkewtina vejîyê. Lazimo ke şarê kurd niwa tepiya, winî bixeftiyo û serkewtinan xo destfîno ke, abûkatî her Öcalanî het şiyayinde xoya piya xebere û mijdanê rindî berê û moralê Öcalanî rind bikirê û o moral hetanî pêdiyin û mijdanê rindanê bînan qîm bikiro.

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beşiktaş/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13

FAX: 251 95 85
■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN

BİRİYAY Dağıtım
■ NİVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02
■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Almanyaya:
Fener Rojbiyanî
Tel: 49 228 92 51 284
■ Fransa:
M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsi

Sed û pêncî hezar dilî bo azadiyê avêt

Bo piştgiriya Öcalan li Bonnê meş



Stranbêjên kurd Merziye û Nasir Rezazî, Ciwan Haco, Şivan Perwer bi stran û klamên xwe-gel bêhtir çoşand. Gelek kesên navdar jî di mîtingê de axavîn.

Di van salên dawîn de, ku têkoşîna gelê kurd li bakurê Kurdistanê di bin rêberiya PKK'ê de gihîştîye asteke bilind û berfireh, gelê kurd êdî serkeftina xwe pir nêzîk dibîne û ji bo wê jî tim di qada xebat û xwenîşandanan de amade ye.

Di roja 17'ê avrêla 1999'an de jî, careke din ji cihan û dagirkerên Kurdistanê re hat îspatkirin ku, kurd ji bo çareserkirina doza bi şan û şerefa xwe yê her tim di meydana de be. Yê li nixê xwe yê neteweyî xwedî derkeve û li ku dibê bila bibe gelê kurd dê Serokê xwe yê neteweyî ji bir nake. Riya wî, riya xizmet ji bo mirovahiya hemdem, riya azadiya Kurdistanê bernade û ev bizava dîrokî wê were berdewamkirin.

Ji serê sibê ji her aliyên Ewropayê jin, mîr, zarok, mezin, pîr û ciwanan berê xwe da paytexta Almaniyayê Bonnê. Ji sê milan: Jozefhohe (baska sor), Pützchenzmark (baska zer) û Niederkasseler (baska kesk) ref bi ref xwe gihan-din cihê mîtingê ya bi navê Freize-

itpark / Rheinaue. Saet li dora 12'ê nîvro li meydana mîtingê her ku diçû hejmara mirovan zêdetir dibû. Piştî demeke kurt, zêdetir 150 hezar kes li qadê civiyabûn. "Azadî ji bo Öcalan, aşî ji bo Kurdistan!", "Bijî Serok Apo!", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!" çend sloganên ku di vê çalakiyê de hatibûn qêrandin bûn.

Hunermend Ciwan Haco, piştî axaftina vekirinê hat ser sehneyê û bi stranên xwe beşdar çoşandin. Piştî Haco, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya jî derket pêşberî dilxwazên Öcalan û bi awayekî nivîskî mesaja xwe ragihand. Piştî stranbêja kurd Beser Şahin (Besê) jî bi stranên xwe yê şoreşgerî bernamaya xwe bire serî. Ji wezîrên berê yê Amerîkayê Ramsey Clart bi şandina mesaja xwe ya nivîskî ji bo Öcalan azadî xwest. Uru Avnery, ku yek ji parlamenterê berê yê Îsraîlê bû, Ulla Lotzer ku nûnera Partiya Sosyal Demokrat a Almanya, yek ji senatorên berê yê Îtalyayê û gelek şexsiyetên din, her yekî bi rengekî piştgiriya xwe bo

Serokê Neteweyî anî zimên.

Stranbêjên kurd Merziye û Nasir Rezazî jî bi hev re çend stranên şoreşgerî pêşkêş kirin.

Ji hêla Konseya Rêveber a PKK'ê ve mesajêke têrnaverok hate xwendin. Di mesajê de, li ser yekî û pêşeroja rewşa şoreşa kurd, mizgîniyên mezin hatin dayîn. Her wiha li ser siyaseta çewt a dewleta tirk, agahiyên pêwîst hatin dayîn.

Saet li dora 16:00'an hunermend Şivan Perwer dest bi bernamaya xwe kir. Beriya konsêra xwe Şivan Perwer bi zimanên kurdî û almanî li ser fedekariya gelê kurd dîtinê xwe rave kirin. Her wiha hunermendê kurd dîsa bi her du zimanan siyaseta qirêj a dewleta tirk û qomploya li dijî Serokê PKK'ê şermezar kir.

Belê... Di 17'ê avrêla 1999'an de gelê kurd careke din yekbûna hêz û îradeya gel û girêdana gelê Kurdistanê bo serokatiya PKK'ê, ji hemû cihanê re da îspatkirin.

KAKŞAR C . ORAMAR

HILBIJARTINÊN BI DEK Î DOLAP

RÊNAS KAYA / AMED

Li Tirkiyeyê hilbijartin, ji bo ku qeyrana pergalê, ya ku ji pirsgerê kurd û şerê qirêj diqewime, bêtrixirab nebe, pêk tî. Lê ji ber ku hilbijartin, bi awayekî nedadyane çêdibin, ji aloziyê xilasbûn jî çênabe. Sedema bêçareseriyê, li meclîsê temsîlkerîna kurdan e. Herêma ku herf zêde beramberî ne-wekheviyê dimîne, cografyaya kurdan bi xwe ye.

Rejîmê, derfetên xwe hemû seferber kirin û di nava çepera tirsê de ji xwe re torek honand. Ev tor, ku bi bînpêkirina nixê mirovahiya û hiqûqê serbilind dibe, di vî hilbijartinê de jî, di zûtirîn katê de derkete holê. Fermana pîrebokê jî postalên leşkeran û lûleyên tivingan bû. Fermana hêza serdest li hemberî kesên ku dengên xwe nadin siyasetmedarên di dilqên "sivîl" de ne, diyar bû. Ji bo ku encamê bigirin, bi her cûre rêbazên anti-demokratîk xwestin hilbijêr û sendoqê bixin bin kontrola xwe.

Ev, têkoşîna rûmeta mirovahiya bû. An bindestan dê postal maçî bikira, an jî bi "mohra na!" dê wekî Şoreşgerê navdar CHE bigotana: "Mirin ji ku û çawa tê bila bê, ser çavan û ser seran!" "Ji bo HADEP'ê Belê!" wekî mora ku herêmê dinimîne xwe da der. Kesên li hemberî vî yekê dîsa çavnebariya xwe nîşan dan, xwestin ku bi awayê "Dengdana eşkere, jî-martina bi dizî" rê li ber vî tercîhê bigirin.

Çepera zilmê, pêka rûmeta mirovahiya neanî û HADEP'ê, tevî navçeyên wekî Licê ku dewletê bo wê digot "Qet na!", deverên wekî Amed, Batman, Çewlik, Cölemerg, Agirî, Sêrt û Wanê serokatiya belediyyan stand û gotina Demirel a bi rengê "Heger kurd hebin dê di sendoqan de derkevin holê." bersivand. Jixwe kurdên ku xwedî li rûmeta mirovahiya derketin û dengên xwe dane HADEP'ê, baş zanibûn ku temsîlkerîna wan li meclîsê zêde ne pêkan e. Dengdana ji bo HADEP'ê li dijî çeper û pîreboka tirsê, bi tenê helwesteke birûmet û însanî bû.

Tabloya meclîsê, ku deriyê wê ji bo kurdan hate girtin, panoramaya Tirkiyeyê careke din raxist ber çavan. Li gorî encamên ne fermî DSP yekemîn, MHP duyemîn, FP jî bû partiya sêyemîn. Lê yek ji wan jî bi giranî ji bo tercîha gel nebûn bersiv. Ev rewş nîşan dide ku hilbijêr baweriya xwe bi tu partiyan rejîmê nayine. Di kesayetiya van partiyan de, rejîmê careke din winda kiriye. Lewre yek ji van partiyan jî nikare Kêşeya Kurd çareser bike. Ev partiyan ku, dê di pêvajoya nû de enfasyon, rêz û rêçikên anti-demokratîk û organîzasyonêke ku ji tenduristî û perwerdehiyê dûr e, dê pêşwazî bikin, rewşa gelê tirk ku hêvî-sikestî ye û ji aliya ruhî ve têk çûye, radixe ber çavan. DSP û MHP ku wekî tercîha gelê tirk tê ne nîşandayîn, bi hev re jî tevbigerin, ji hev cuda jî tevbigerin, dê careke din Tirkiyeyê bixin bin baskê MC (Milliyetçi Cephe/Eniya Neteweperest) yeke nû.

Encam çî dibe bila bibe, heta ku kurd neyên temsîlkerin, yek ji wan jî nikare kêşeyê çareser bike.

Lê di rêberiya herêmî de, dê HADEP kurdan temsîl bike. Jixwe tercîha mezin a kurdan jî ev bi xwe bû. Di warê herêmî de be jî, wê xwe jî, bajarê xwe jî, ew bi rê ve bibin.